

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat


Hejmar: 4

Sal: 1

Çileya Paşîn 1993

Bîha: 10.000 TL

“Pirsgirêka Kurdan”





www

Xwedî

(Sahibi)

MAHMUT YARLUĞ

Berpirsîyarê Giştî

(Genel Yayın Yönetmeni)

SABAH KARA

Berpirsîyarê Nîvîsaran

(Sorumlu Yazışları Müdürü)

SÜLEYMAN ÇEVİK

Mudîrê Dezgahê

(Müessesesi Müdürü)

MÜŞTEHİR KARAKAYA

nûbihar kovareke mehanî ye
ku bi weşandina karpêkên
çanda Kurdî bi mana tevayı
dilebike.

Raman û rayên xwedyên kar-
pêkan, lizûmen ne raman û
rayên **nûbihar** in. Nivisarên
ku bi imzeya Berpirsiyâre Giş-
tî weya bi navê **nûbihar** têñ
weşandin raman û raya **nûbi-**
har nişan didin.

nûbihar di serrastkirina kar-
pêkên şandî de azad e.

Bedela abonetiya salını

(12 hejmar):

Li hundir: 120 000 TL

Li derive: 50 DM

Postgiro (Posta Çeki):

Süleyman Çevik, 658265

Jimareyên hesabbankı:

Li hundir: Süleyman Çevik, İş
Bankası Yavuzselim Şubesi,
1079-300-235999

Li derive: Süleyman Çevik, İş
Bankası Yavuzselim Şubesi,
1079-30100-3118770

Navnişan (Adres):

Fevzipaşa Cad. Başhoca Sok.
49/1, Fatih-İstanbul
Tel: 533 75 88

Tîprenzi (Dizgi):

nûbihar

Berg (Kapak):

Dönüş

Çapxane (Matbaa):

Mutlu Ofset

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

DESTPÊK

- Hejmara çarem pîroz be! 3

nûbihar

SERNIVÍSAR

- "Pirsgirêka Kurdan" 5

SABAH KARA

AYETNAME

- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd 7

AZAD ZELAL

HEDÎSNAME

- Çend hedîsin ji Pêxember ê Ekrem 9

MEHMET SEYDAOĞLU

LÊPIRSÎNA "PIRGIRÊKA KURDAN"

- Serokê "Komela Piştgîrî Ji bona Mafêن Mirov û
Mazlûman" (Mazlum-Der) M. İHSAN ARSLAN 12

- Xwedî û Berpirsiyâre Giştî yê Kovara "Nûdem"
FIRAT CEWERÎ 13

- Sekreterê Giştî yê "Weqfa Maf û Azadiyên
Kurdan" YILMAZ ÇAMLIBEL 14

- Nivîskar ATASOY MÜFTÜOĞLU 16

- Pirsa Kurdan İslâm hel dike 18

SÜLEYMAN ÇEVİK

- Hevpeyivîna rojnameya "Özgür Gündem" bi
Berpirsiyâre Giştî yê me SABAH KARA re 23

- Bersîva Berpirsiyâre Giştî yê me SABAH KARA
bi lêpirsîna heftenameya "Azadî" 25

WEŞANNAME

- Kovareke delal î Kurdi: Nûdem 22

ROJIN ZELAL

HELBEST

- Muxbeçeyên meyfirûş her seherî têñ sema 10

MELA EHMED ê CİZİRÎ

- Li ser wefata Bedîuzeman Seîd ê Norsî 20

SEYİD ELİ YÊ FİNDIKÎ

- Nameyên bêcewab / 3 21

SABAH KARA

- Mi umrê xwe li hîçê xerc kiriye 26

YÜNIS EMRE

DIMILKİ

- Ma tim bermay 27

MUHAMMED PAŞA

ZAROKNAME

- Pîetros 28


SERWER PÜRYA / SABAH KARA

RÊZIMAN

- Rêzimana Kurdi 30

RÊZEPIRS

ALI KEÇELİ



HEJMARA ÇAREM PÎROZ BE!


Em dixwazin qismek ji nameyên we di kovarê de biweşînîn. Lêbelê dibe ku binin ji we, bun nameyên xwe ne ji bona weşandinê rûbikin. Loma em rîca dikin ku yên ku naxwazin nameyên wan di kovarê de biweşin, bila vê di nameya xwe de binvîsin.

nûbihar

Xwendevanê delal! Em dixwazin qismek ji nameyên we di kovarê de biweşînîn. Lêbelê dibe ku binin ji we, bun nameyên xwe ne ji bona weşandinê rûbikin. Loma em rîca dikin ku yên ku naxwazin nameyên wan di kovarê de biweşin, bila vê di nameya xwe de binvîsin.

Sernûçeya vê hejmarê, "Pirsgirêka Kurdan" e. Em dixwazin di vê hejmara xwe de li ser vê pirsê bisekinin. Lê weke ku hun dizanin, ev pirs ne pirske kurt û sade ye. Loma em dê di hejmarê xwe yên hatî de jî vê pirsê bidomînin. Di vê hejmarê de em çar bersivêne lêpirsîna xwe ya "Pirsgirêka Kurdan" diweşînîn. Em dê bersivêne din di hejmarê xwe yên hatî de biweşînîn. Em hê jî li benda bersivêne nivîskar û rewşenbîran in. Yên ku dixwazin, ji vê û pê de jî karin bersivêne xwe ji me re rûbikin. Lewra em dixwazin heta ku bibe, em li ser vê pirsê bisekinin.

Hun dê di vê hejmarê de hevpeyivînek û lêpirsînek ji Berpirsiyare Giştî yê me bixwînin. Hevpeyivîna ku rojnameya *Özgür Gündem* bi Berpirsiyare Giştî yê me re kiriye û bersîva wî bi lêpirsîna rojnameya *Azadî*. Ji ber ku munasebeta wan bi "Pirsgirêka



Kurdan" re heye, me wergerandîn zimanê Kurdî û em wan di vê hejmarê de diweşînîn. Di hejmarê xwe yên hatî de jî em dê cih bidin van celebnîvan.

Em dixwazin hinek jî li ser tebrîk û pêşniyar û rexneyêne we bisekinin:

Birayê me Mîrza **M.Şakir e Koçer** di nameya xwe ya Kurdî de dibêje ku: "Xweda yê Zilcelal kar û xebata we li hev bîne. Em hêvîdar in ku bun bibin dengê me. Arîkariyê re ci pêwisi be, em ji we re amade ne." Em pirr spas dikin. Tişte ku em ji birayêne xwe dixwazin ewe ku, hun name û nivîsen xwe kêm nekin û hun ji bona belavkirin û abone peydaki-

rinê bixebeitin. Xweda arîkarê we û me be.

Birayê me Mîrza **İbrahim Bor** jî di nameya xwe ya spehî û pirr dirêj (lê bi Tirkî) de pişî pesn û meth û tebrîkêne xwe, pêşniyar û rexneyêne ku li dormandorê xwe bihîstiye ji me re rêz dike û dibêje ku: "Hinin ji hevalan dibêjin ku, ko hinek ji nivîsen kovarê bi du zimanan, bi Kurdî û Tirkî çap bibin, dê çêtir werin fam kîrin." Ev pêşniyar li gor ramana me, ne li cih e. Lê ji ber ku sebeb pirr dûvdirêj e, em naxwazin li vir ser sebeba redkirina vê pêşniyarê bisekinin. Birayê me dûvre dibêje ku: "Hinin ji birayan jî dixwazin ku çend rûpelên kovarê bi tîpêne Erebî werin çapkîrin." Ev pêşniyara birayê me maqûl e. Em dê inşaelah vê daxwaza birayêne xwe heta ku ji destê me were, bi cih bînin. Lewra ekseriyeta Kurdan ji tîpêne Erebî istîfade dikin. Lê ji bo ku Kurdêne vêderê zêde bi tîpêne Erebî nizanîn bixwînin û binvîsin, me tîpê Latînî tercîh kiriye. Ya din jî eve ku, tîpêne Latînî, tîpêne famêla zimanê me, yanê famêla Hind-Ewrûpa ne. Bira **İbrahim** dibêje ku: "Rexnek din jî eve ku, mîna ku kovar, ji raman û îrşadê zêdetir, li ser bipêşdebirina zimanê Kurdî disechine." Ev tesbîta bi-

rayê me, di cih de ye. Heqî-
qeten em ji fîkr û îdeolojiyê
bîzêdetir li ser ziman diseke-
nin. Lewra heger nêta me, bi
tenê teblîx kirina îdeolojiyekê
bûna, menê ji zimanê ku her-
kesî vî diyarî wî zanin, yanê ji
zimanê Tirkî îstîfade bikira.
Lêbelê em dixwazin ku em zi-
manê Kurdî bipêş de bibin û
em bikin ku di hatiyeke nêzîk
de ev gel, yanê gelê Kurd ka-
ribe di her aliyê jiyana xwe de
ji vî zimanê ezîz îstîfade bike.
Em bawerin ku dê ev, di hati-
yeke nezîk de, bibe. Em rîca
dikin ku birayê me heta wî
wextî sebrê bikşînin. Birayê
me **İbrahîm** duvре dibêje ku:
*"Elhemdulilah, digel vê qasê
ku karpêkên ewîlîn in, wer-
gerên we pirr di cih de ne. Xu-
sûsen jî, wergera Peyiva Bîst û
Seyemîn."* Em pirr spas dikin
bira **İbrahîm**. Digel vê qasê
ku nameya te, bi qasê ku ev
Destpêk tev de kare li ser we-
re nivisandin giring e, lêbelê ji
ber ku cih tineye, em li vir di-
sekinin.

Birayê me Mîrza **Mehmed Can Aydin** di nameya xwe ya
Kurdî de dibêje ku: *"Gelî en-
dam, nivîskar û xebatkarên
kovara İslamiya Nûbihar. Ez
xortekî şanzdeh salî me. Ji lî-
seya Îmam-Xeîb a Bursayê em
çend xwendekarên Kurd, bi se-
beba derhatina vê kovara İslamiya
Kurdî em ji we re gelek
spas dikin. Ev xebata we gelek
pîroz be. Me zûda rîya kova-
rekî İslamiya Kurdî wek Nûbi-
har dipa. Em bewcedarê wê
bûn. Sebeba ku ev xwestina me
bate cib, em gelek kîfxwes û
dilşad in. Yezdan we di vê xe-
bata we de pîroz bike. Amîn."*
Em pirr spas dikin bira **Mihe-
med Can**.

Birayê me Mîrza **Mehmed Diyaeddin Dağhan** di name-
ya xwe ya Kurdî de dibêje ku:
"Gelê berpirsiyarên Nûbihar!

*Selama Xwedê li ser hewe be.
Ez gelek spas dikim ji bo der-
ketina kovara İslamiya Kurdî.
Daxwazek min ji we heye: Em
çawa naxwazin di zimanê Tirkî
de bê gotin "Inek Sûresi", di
zimanê Kurdî de jî em nax-
wazin bê gotin "Sûreta Man-
ge". Ji bo vê, bi baweriya min
ko ji bin serlewheya "Sûreta
Beqere", bêjeya "Mange" were
avêtin, qençtir e. Lêbelê her ci
min vê gotibe jî, bun ji min
zanatir in; bun çawa biecibî-
nin wisa binvîsin." Em pirr
spas dikin bira **Mihemed Di-
yaedîn**. Em bêjeya "Mange"
ne bi mana navê sûretê, lê ji
bona ku heval zanibin ku ma-
na "Beqere" ci ye, dinvîsin. Em
navê sûretê bi şiklê "Sûreta Be-
qere" dinvîsin û di nava pa-
rantêzê de em "Mange" datî-
nin. Lêbelê heger ev bêje bi-
rayê me nerehet dike, em
amade ne ku wê bavêjin. Het-
ta em dê inşaelah di vê hej-
marê de vê bêjeyê bavêjin. Bi-
la dilê birayê me rahet be.*

Birayê me Mîrza **M. İrsâd Cûdî** di nameya xwe ya Kurdî
de dibêje ku: *"Birayén min i
delal û hêja, xebaikarên Nû-
bihar! We valayyeke pirr gi-
ring dagirt û we gavek bi mera-
nî avêt; Yezdanê mezîn ji we
razî be. We di hejmara seye-
mîn de gotiye, "Ko bun navê
xwe yê esli binvîsin zehf baş
e."* Lêbelê gereke em paşnavê
xwe bi Kurdî binvîsin; ma ji
Tîrkan re ne bes e! Mînak; paş-
navê min "Adak" e, lê ez vî qe-
bûl nakim û ez "Cûdî" dinvî-
sim. Hêviyeke min i din jî heye
ku bun di kovarê de bi gelekî,
helbesten şairên Kurd biweişî-
nin. Li holê bi hezaran hel-
besten şairên Kurd bene, lê
bun ji Yunus, Tarancı û hwd
helbestan diwergerînin. Ev
nêzîkî sed salî ye zimanê me,
navê gund û çiyayê me,
xwendin û çanda me hâtiye

qedexekirin. Brayê me yê
Tîrk, Ereb û Fars, li ber vê men-
zerê ji bil seyrkirinê ti tiştek
din nekirin. Me hebûna wan
qebûl kir, lê wan em încar ki-
rin. İro vaye bîlanço, xwîn û
derd û kul e! Lêbelê êdî bes e!
Gereke fikra umetê û İslâmî
em bi Kurdî ji gelê Kurd re
bibêjin; gereke em nîşan bidin
ku wekheviya gelan di İslâmî
de ye û em van bibêjin, binvî-
sin û belavkin! Xelasî di İslâmî
de ye. Bîfî azadiya İslamiya
Kurdistan û Tîrkiyê!" Em pirr
spas dikin bira **M. Cûdî**. Ya ku
me ji birayan xwestibû ku na-
meyen xwe bi navê esliyê xwe
ji me re rîbikin, ji bona vê bû
ku em bizanin ku kî ji me re
name rîkiriye. Em jî paşnavân
Tîrkî bêmana hesab dikin. Te
pirr baş kiriye. Te paşnavê xwe
yê Tîrkî ji me re rîkiriye da ku
wextê ku lazim bû, yan ferezen
ko em hatin bajarê te, em ka-
ribin te peyda bikin, yan li halê
te bipirsin û selamekî bidin te.
Lê piştî ku heval paşnavê xwe
yê mewcûd ji me re nivisan-
din, helbet karin bi xwe paş-
navê xwe hilbijerîn. Ev heqê
wan e. Hetta gereke ev paş-
navân sun'î bizûyî ji holê rabî-
bin. Lêbelê ji bona nasînê, ge-
reke em nameyên xwe bi navê
ku em pê têne naskirin rîbikin.

Birayê me Mîrza **A. Reme-
zan Wanî** ji me re nivisarek û
helbestek xwe rîkiriye. Nivîsar
û helbesta wî bi Kurdî ne, lê
nameya ku ji me re nivisandi-
ye, bi Tîrkî ye. Bira **Remezan**
di vê nameya xwe ya bi Tîrkî
de dibêje ku: *"Ko bun minasib
bibînin, ez dixwazîm nivîsar û
helbestê xwe yê mutewazî ji
we re rîbikim."* Em dixwazin bi
vê munasebetê ji hemû birayê
xwe re bibêjin ku, yê ku
destê wan qelec digre û karin
tiştina binvîsin, bila karpêkên
xwe ji me re rîbikin. Nivîsarên
ku qabilî weşandinê bin, em

dê biweşînîn însaelah. Zor spas, bira **Remezan**.

Bira Mîrza **Zeynelabidîn** ji me re pîroznamekê rîkiriye. Di vê pîroznameya xwe de bi zimanê helbestvanî yê şérîn dibêje ku: "Ey Nûbihar / Tu ûlham ì ji gora Ebmed ê Xanî / Xwerû bi Kurdî zimanî di vî zemanî / Dilxwes û devliken in em bi te / Her wekî jînveda Xanî bi te / Sersala te pîroz be / Bi azadiyê kêfxwes be / Bi Kurdî dilges be / Û temenê te sermedî be." Zor spas, bira **Zeynelabidîn**.

Bira Mîrza **Receb Maraşlı** bi navê xebatkarên **Weşanxaneya Komalê** ji me re pîroznamekê rîkiriye. Zor spas.

Pîroznamek jî ji **Navenda Çanda Mezopotamya** hat. Zor spas, **Navenda Çanda Mezopotamya**.

Me dixwest ku em li ser hemû nameyênu xuh û birayênu xwe bisekinin; lê malesef cih nema. Em dê bi zikra navênin ji wan, **Destpêka** vê hejmarê temam bikin:

Mrz. (:Mîrzê) **Gulten Yaşa**, Mr. (:Mîrza) **Mehmed Çelik**, Mr. **Mehmed Soysal**, Mr. **Serdem**, Mr. **Xwedêperest**, Mr. **Muhammed Dilşad**, Mr. **Elveda Orhan**, Mr. **Abdullah Emîn Rüzgar**, Mr. **Omer Farûq Çetinkaplan**, Mr. **Zeynel Kurtulmuş**, Mr. **Mehmed Polat**, Mr. **Şukrullah Yıldız**, Mr. **Hayreddîn Ersoy**, Mr. **Muhammed Serdar**, Mr. **Xelil Dost**, Mr. **Seyda Dilkânî**, Mr. **Memê Alan**, Mr. **Mustafa Şeker**, Mr. **Cezair Açıkcâ**, Mr. **Mehmed Selîm Bayram**, Mr. **Abdullah Yıldız**, Mr. **Hêvîdar Amed**, Mr. **Abdullah Pınar**, Mr. **Râîf ê Bêçare**.

Heta hejmara hatî, di bin siya selam, rehmet û bereketa Xweda de bin; wesselam!

"PIRSGIRÊKA KURDAN"

Di vê dewletê de belengaz û xizan û feqîr û bêkes ji kîja nijadî bin, di bin darê zorê de ne, yan jî di bin siya darê zorê de ne. Lêbele Kurd, him bêkes û him belengaz û him xizan û him feqîr û him jî Kurd in.

SABAH KARA

Tiştê ku nîşan dide ku dewletek çiqas ehemî yet dide azadî û edaletê ewe ku, ew dewlet çiqas heq û garantiyan daye belengaz û xizan û feqîr û bêkesen xwe.

Dewleta ku belengaz û xizan û feqîr û bêkesen wê ji cîheta heq û garantiyan di kîmasiyê de ne, ew dewlet ne adil e, di wê dewletê de edalet ne serpa ye.

Ev dewleta ku em tê de dijin, ji vê cîhetê ji sefiltirîn dewletên cîhanê ye. Esasê vê dewletê li ser qazûrat û pîsiya zilmê hatiye danîn.

Di vê dewletê de heq û huquq û nan bi tenê ji bona belengaz û xizan û feqîr û bêkesan re di devê şer de ye.

Ev mazlûm, xwe di vê dewletê de xerîb û zêde dibînin; ne leşkeran leşkerê xwe, ne polisan polisê xwe, ne dadgehan dadgehê xwe, ne naxweşxaneyan naxweşxaneyê xwe û ne jî xwendegêhan xwendegêhê xwe dibînin; elhasil, ti teşkilatê vê dewletê, yê xwe nabînin.

Ev dewlet bi her tiştê xwe ve dijminê belengaz û xizan û feqîr û bêkesan e. Kî bêkes

be, zilmê dibîne. Kî feqîr û xizan û bêengaz be, zilmê dikşîne.

Maziya vê dewletê tişe zilm û ceberût e. Hatiye ti mazlûmî jî di vê dewletê de ne emîn e. Her bêkes, her roj li benda zilmê ye. Ne malûm e ku wê kîja rojê ji çepilê wî bigirin.

Erê, di vê dewletê de belengaz û xizan û feqîr û bêkes ji kîja nijadî bin, di bin darê zorê de ne, yan jî di bin siya darê zorê de ne. Lêbele Kurd, him bêkes û him belengaz û him xizan û him feqîr û him jî Kurd in. Ev dewlet bi qasî ku li Kurdan zilm kiriye, li ti kesî din zilm nekiriye.

Di vê dewletê de, bila serê turîzm û kompleksê sax be, pespayetirîn zimanên dinyayê bi raheti di her teşkilatê dewletê de bir serbesî û hesanî têşkilîn û têşkilîn; di radyo û televizyonan da xuruxur a zimanên muxtelif e; lîbelê wextê ku behs bigihe Kurdên ku ew jî xwedyêni esliyê vî welatî ne, "yê ji me çêtir" derdi Kevin holê û dengê borezanê romiyêni wan guhê me kerr dikin. Îznê nadîn ku Kurd ji îmkânên însanî û fitri, îstîfade bikin.

Bi rexma ku sebeba esliya her dewletê, gereke muhafeze kirina belengaz û xizan û bêkesan be; ber ekis, sebeba mewcûdiyeta vê dewleta ku em tê de dijin ewe ku, belengaz û xizan û bêkesan hefsar bike.

Gereke wêzîfa dewletê, di nav hemû tebeqeyên cemiyetê de navcîti be. Yanê di heqîqetê de dewlet, gereke heqê kesen ku heqê wan hatiye standin bide wan; gereke ji qewîyan bigre û bide zeşfan; gereke ji serwetmendant bigre û bide feqîran.

Lêbelê di vê dewleta ku em di bin barê wê de dinalin de, hemû karê ku dewlet dike ewe ku, ji heqdaran digre û dide neheqan, ji zeşfan distîne û dide qewîyan, ji feqîran digre û dide serwetmendant. Yanê di heqîqetê de ev dewleta li pişta me barkirî, ne dewleta belengaz û xizan û fêqîr û bêkesan e. Jixwe halê Kurdan hê jî eşkeretir e. Herkes zane ku ev dewlet, eslen ne'dewleta Kurdan e.

Di vê dewletê de hilbijartin û hatin hilbijartin, pêkenokeke enteresan e. Çil sator di vê partiyê de ne, çil qantir jî di partiya din de ne û ji xelqê re tête gotin: "Keremkin, yekê ji van hilbijêrin!"

Di vê dewletê de her tiştên ku merev ji xwe re naxwaze, ji dîgeran re têx xwestin û her tiştên ku merev ji xwe re dixwaze, ji dîgeran re eslen nayin xwestin.

Evênu ku karê ku Bulgaristan di mudeteke kin de kir "wehşet" qebûl kir in, ew bi xwe ji yek qernî zêdetir e rehmetê li bav û bepîrê Bulgaristan didin xwendin.

Gelo ev dewlet dewleta kî ye?

Xwedyê nemeşrûyê vê



dewletê kî ne?

Xwedyê nemeşrûyê vê dewletê, ji teşkîl kirina Cumhuriyetê heta nuha, Serperistiya Leşkeriya Giştî (Genel Kurmay) ye û weke ku êdî herkes dizane, ev teşkîlat jî, di bin emrê Amrîka û NATO'ye de ye.

Hukûmeta li ber çava, eslen ti mana ifade nake. Ko hukûmetên muxtelif bixwazin jî, bê izna xwedyê nemeşrûyê eslî, yanê Serperistiya Leşkeriya Giştî, nikerin ti tiştî bikin.

Naxwe berî he tiştî, gereke em terefê muqabil binasin.

Gereke em bizanin ku, kî rêya me girtiye.

Ma êdî ne bes e?

Ma wê ev zilm û talan û zordarî heta kengî bidome?

Ma ev "cumhûriyet" û "demokrasî" ya derewîn, wê heta kengî di pin eyarê berx de guรîtiya xwe bidomîne?

Wê heta kengî navê Kurdan "koçber" û "mazlûm" û "xizan" û "belengaz" û "bêkes" be û paşnavê wan wê "kuştî" be?

Edî bes e!

Em azadî dixwazin!

Em edalet dixwazin!

Em wekhevî dixwazin!

Em dostî û aşitî dixwazin!

Bi qewla Cegerxwîn: Em naxwazin ku ev dewlet rîncberê dijminên me be û em rîncberê vê dewletê bin!

Em naxwazin ku em karewana devehan bin û ker li pêsiya me bin!

"Pirsgirêka Kurdan" di merhela pêşin de pirsgirêka hemû mirovên vê dewletê ye û di merhela paşin de pirsgirêka hemû mirovên dinyayê ye. Loma ez "Pirsgirêka Kurdan" di nav dunikan de dînvîsim.

Wê her û her Kurd ji vî hâlî xilas bibin. Tav derhat û wê tarâtî hedî hêdî winda bibe. Lê tiştê ku em dixwazin ewe ku, xwîn ji vê zêdetir nerije. Û ez bawerim ku wê taliya talî ev Kurdên reben him azad bîbin û him ji wê azadiyê bikin nesibê hemû gelên vî diyarî.

Ma hun nabînin ku îro her azadiya ku dighe deste gelên vî diyarî, bi sayeta xwîna Kurdan e?

Naxwe gereke' em newestin.

Gereke em wezîfa xwe pêk bînin û bawer bin ku, sibeh nêzîk e.

Xwezî bi wê xweşbextiyê!

ÇEND AYETİN JI QUR'AN A MECİD

Weke ku xwendevanên me zanin, em di ber hejmara xwe de çend ayetin ji Qur'an a Mecîd diweşînin. Heta nuha me Sûreta Fatîbe û 75 ayetin ji Sûreta Beqere weşandin. Em dê însaelab di hejmarê xwe yên batî de jî vê xizmetê bidomînin. Di vê hejmara me de ayetên 75 îla 100 ên Sûreta Beqere li jêr hatine.

AZAD ZELAL

SÛRETA BEQERE

Bi navê Xweda yê arîkarîxwaz û bimerhemet.

76- Wextê ku rastê mûminan têن, dibêjin: "Me îman anîye." Lê wextê ku pevre tenê dimînin, dibêjin: "Aya hun tiştê ku Xweda ji we re vekiriye, ji wan (mûminan) re dibêjin, da ku di dergeha Rebbê we de, wan tiştén li we bikin delîl? Ma hun nafîkirin?"

77- Aya ma ewan nizanin ku Xweda her tiştê ku di-veşîrin û her tiştê ku eşkere dîkin, dizane?

78- Hinin ji wan jî umî ne (:xwendin û nivîsinê nizanin); kitêbê nizanin, ji bil tiştên bêeslê ku bihîstine. Ewen li gor zennê hereket dîkin.

79- Way li wan kesên ku kitêbê bi destê xwe dinvîsin û ji bona ku hinek menfaet peyda bikin, dibêjin: "Jî canibê Xweda nazil bûye." Way li wan, ji bona tiştê ku

nivisandin û way li wê menfaeta wan.

80- Û gotin: "Agir (ê cehenemê) ji bil çend rojan bi me nakeve." Bibêje: "Aya ma we li ser vê bi Xweda re ehd girêdaye? Ku Xweda eslen ji ehda xwe navegere. Yan hun ji ber nezaniya xwe; di heqê Xweda de tiştê ku hun nizanin, dibêjin?"

81- Erê. Yêن ku karê neqencî dîkin û di guneh de xerq dibin, ewan ehlê agir in û wê tê de heta ebedê bimînin.

82- Û yen ku îman anîne û emelên salihî dîkin, ewan jî ehlê cenetê ne û wê tê de heta ebedê bimînin.

83- Me ji Benî Îsraîl ehd girtibû ku: "Ji bil Xweda, ji kesî din re îbadet (û ebdîtiyê) nekin û qencyiyê li dê û bav û ehlê xwe û yetîman û bêkesan bikin û bi mirovan peyivên qenc û xweş bibêjin û nimêj bikin û zekatê bidin." Lêbelê ji bil hinek ji we, we pişta xwe lê zîvirand û hun hê jî dizîvirînin.

84- Me ji we ehd girtibû ku: "Xwîna hevûdu nerjînin û hevûdu ji mal û warê hev

dernexînin (û ji welêt sergûn nekin)." Û wê vê ehdê qebûl kiribû ku hun hê jî şahidê vê nin.

85- Naxwe hun ew in ku hun hevûdu dikujin û hun qismin ji xelqê xwe ji diyarê wan derdixin (û sergûn dîkin) û li eleyhê wan, di gunehkarî û dijminetiyê de hun pişta xwe didin hev û îtîfa-qan pêk tînin û wextê ku bi destê we de êsîr dikevin, hun ji bona wan fîdyê distînin. Lêbelê ev li we heram bibû. Ma gelo hun ji kitêbê qismekî qebûl dîkin û qismê din încar dîkin? Behra kesê ku vê dîkin, di dinyayê de ne tiştek din e ji bil rezîl û xwar bûnê û di roja axretê de, wê ezabeke elîm bibînin. Xweda, hemû tiştên ku hun dîkin, dizane.

86- Han evan ewin ku, axretê dane û pê, heyata dinyayê kirî ne. Ji ber vê, ne ezaba wan dê kêm bibe û ne jî dê li wan arîkarî bibe.

87- Muheqeq ku Me bi Mûsa kitêb da û pişî wî, Me peyamberan şand. Û bi Îsa kurê Meryem, Me delîlên rewşen înayet kir û Me wî bi

Rûhilquds tayîd kir. Û her wextê ku peyamberek hat û tiştê ku li nefsa we xweş naye anî, we serkeşî kir û we hinin ji wan (peyamberan) înakir kir û hinin ji wan jî kuşt.

88- Gotin: "Dilê me girtî

ne." Na, Xweda li wan ji ber kufra wan lanet kiriye. Çiqas kêm iman tînin!

89- Wextê ku ji dergeha Xweda ji wan re kitêbek hat û wê (kitêbê) nas kirin û ew, kitêba wan (Tewrat) jî tesdiq dikir, ku li bendê bûn, da ku li ber kafiran pîrûz bibin; bi wê (kitêbê) iman ne anîn; ku laneta Xweda li ser kafiran be.

90- Bi xwe neqencî kirin ku ji ber hesûdiya xwe, bûne kafirên kitêba Xweda û ji wê ku Xweda fezl û kerema xwe bi her kesî ji ebdê xwe ku bixwaze ihsan dike, hesûdî kirin. Bi vî awayî, xezeb li ser xezebê bi serê xwe de zêde kirin. Ji kafiran re eza-beke ku wê wan rezîl bike heye.

91- Wextê ku ji wan re tête gotin: "Bi tiştê ku Xweda nazil kiriye iman bînin"; dibêjin: "Em bi tiştê ku ji me re nazil bûye iman tînin." Û tiştê piştî wê (:Qur'an) înakar dikan. Ewko ew (:Qur'an) heq e û tiştê li cem

ان هذالقرآن يهدى للهى هى اقرئن

بسمه تعالى

عَنْ عَلَىٰ بْنِ أَبِي طَالِبٍ (ع) أَنَّهُ قَالَ: إِنِّي قَدْ سَمِعْتُ رَسُولَ اللَّهِ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ يَقُولُ: أَلَا إِنَّهَا سَكُونٌ فِتْنَةٌ، فَقَلَّتْ مَا الْمَخْرُجُ مِنْهَا يَا رَسُولَ اللَّهِ؟ قَالَ: كِتَابُ اللَّهِ، فِيهِ تَبَآ مَا كَانَ قَبْلَكُمْ وَحَيْرًا مَا بَعْدَكُمْ، وَحُكْمُ مَا بَيْنَكُمْ، وَهُوَ الْفَصْلُ لَنِسْ بِالنَّهْرِ؛ مَنْ تَرَكَهُ مِنْ جَبَارٍ فَصَمَمُهُ اللَّهُ، وَمَنْ ابْتَغَى الْهُدَى فِي غَيْرِهِ أَضْلَلَهُ اللَّهُ.

(سنن الترمذى: فضائل القرآن: باب ١٤)

wan (:kitêbê wan) jî tesdiq dike. Bibêje: "Heger we iman anîbû, naxwe we çima berê peyamberanê Xweda dikuştin?"

92- Mûsa bi delîlên rewşenê xwe ji we re hat. Lî we piştî wî (:Mûsa), golikê ji xwe re kire xweda. Han, hun wisa zalim in.

93- Me bi we re ehd girêda û Me Tûr li ser serê we de bilind kir (û Me go:) "Êdî tiştê ku Me ji we re şandîye (:Qur'an), bi imaneke kûr qebûl bikin û guh bidinê." Gotin: "Me bihîst û em red dikan." Ji ber kufra wan, evîna golikê di dilê wan de cih girtiye. Bibêje: "Heger hun iman dikan, ev imana we ci tiştek neqenc emr û pêşkeşî we dike."

94- Bibêje: "Heger hun rast dibêjin ku diyarê axretê di dergeha Xweda de malê xasê we ye, ne kesin din; naxwe de ka mirinê ji xwe re bixwazin (da ku hun bigihin meqseda xwe)."

95- Lîbelê bi sebeba

emelên ku kirine, hîç wext dê nikaribin mirinê bixwazin. Xweda zaliman nas dike.

96- Muheqeq ku tê wan ji mirovén din, hetta ji müşrikan jî zêdetir bi jiyana vê dînyaye herîstir (û

çavbirçitîr) bibinî. Her yek ji wan, dixwaze ku hezar sal bije; lîbelê ew jiyana dirêj jî nikare wan ji ezaba Xweda xelas bike. Xweda tiştê ku ewan dikan, dibîne.

97- Ji wan ên ku dijminetiya Cebraîl dikan re bibêje ku: "Muheqeq ku ew (:Cebraîl) e yê ku vê kitêbê (:Qur'an) bi ferмана Xweda ber dilê te nazil kiriye, da ku yên berî xwe (:Tewrat, Încîl û hwd) tesdiq bike û ji müminan re bibe hîdayet (û rîber) û mizgînî."

98- Her kî dijminê Xweda û ferîşteyên Wî û peyamberen Wî û Cebraîl û Mîkaîl be, (bila bizane ku) Xweda jî dijminê kafiran e.

99- Muheqeq ku Me ji te re (ey Muhammed!) ayatê rewşenî nazil kir. Û ji bil fasiqan (û yên ku ji rî derkete), ti kes wan înakar nake.

100- Ewan ci wext ehdékê dabin, ma hînin ji wan wê ehdê xira nekirin? Erê, bêhtirê wan, iman naynin.

ÇEND HEDİSNİN JI PÊXEMBERÊ EKREM

"Misliman birayê misliman e. Xaîntiyê lê nake. Wî derewîn dernaxe. Wî fedîkar nake. Her tiştê misliman ji misliman re heram e: Namûsa wî, malê wî, xwîna wî... Aha, teqwa ev e. Wextê ku misliman birayê xwe heqîr û piçûk bibîne, ev guneh, besî wî ye."

MEHMET SEYDAOĞLU

1- Roja qiyametê wê heq, li xwediyê xwe bêne vegendarin. Heta heyfa mîha bêsitre ji mîha bisitre wê bê stendin. (*Muslîm ji Ebu Hurreyre*)

2- Misliman ewe ku, mislimanê din zirara xwe ji ziman û destê wî nebînin. (*Buxarî û Muslîm ji Ebdullah Ibn Amr Ibn As.*)

3- Tiştê ku hun ji xwe re dixwazin, heta ku ji hevalê xwe re jî nexwazin, hun mûmîn nayênen hesêbkirin. (*Buxarî û Muslîm, ji Enes*)

4- Ê ku rehmê li însanan neke, Xwedê jî rehmê lê nake. (*Buxarî û Muslîm, ji Cerrîr Ibn Ebdullah*)

5- Misliman birayê misliman e. Xaîntiyê lê nake. Wî derewîn dernaxe. Wî fedîkar nake. Her tiştê misliman ji misliman re heram e: Namûsa wî, malê wî, xwîna wî... Aha, teqwa ev e. Wextê ku misliman birayê xwe heqîr û piçûk bibîne, ev guneh, besî wî ye. (*Tirmîzî, ji Ebu Hurreyre*)

6- Bereketa Xwedê ne li ser wî mîletî be ku heqê

mazlûm ji yê zalim nayê standin û pozê wî nayê firkandin. (Ji *Cabir*)

7- Neheqî roja qiyametê, meriv di nava tarîtiyê de dihêle. (*Buxarî û Muslîm û Tirmîzî, ji Ibn Omer*)

8- Ebu Mûsa got: "Min bi hîst Pêxember (SXL) wisa got: "Xweda bîhna fêreh di-de merivê zalim. Lê weqta ku wî zeft kir, êdî wî naberde." Û piştra ev ayeta ha Xwend: "Zeftkirina Rebbê te ji welatê zalim re wisa ye. Zeftkirina Rebbê te bê sek pîrr dijwar e, zahmet e." (Sûreta Hud: 102) (*Buxarî û Muslîm û Tirmîzî*)

9- Numan Ibn Beşîr got: "Carekî piştî nimêja işayê em li mizgeftê bûn. Min dî Pêxember (SXL) hat cem me. Çavê xwe ber bi jor kir û danî. Me got belkî tiştekî li jor qewimiye. Got: Hayê we bila jê hebe, piştî min wê serokine derewîn û zalim çêbin. Ê ku derewê wan tesdiq bike û alîkariya zilma wan bike, ew ne ji min e û ez jî ne jê me. Ê ku derewê wan tesdiq neke û alîkariya zilma wan neke, ew ji min e û ez jî jê me." (*Ebmed Ibn Malik*)

Henbel

10- Ê ku alîkariya dozeke neheq bike, xezeba Xweda wê li ser be. (*Ebu Dawud, ji Ibn Omer*)

11- Ê ku alîkariya dozeke neheq bike, heta ku vegere, wê xezeba Xweda li ser be. (*Hakîm ji Ibn Omer*)

12- Ê ku bi zalimekî -ko zanibe zalim e- re ji bo alîkariyê bimeşe, ji islamê dûr dikeve. (*Teberanî ji Ews Ibn Şurehbîl*)

13- Seîd Ibn Zeyd got: "Min ji Pêxember wisabihîst: "Ê ku ji erdê tiştekî hindik bi neheqi zeft bike, roja qiyametê bi heft qatê wî tiştî jê tê girtin." (*Buxarî*)

14- Ebu Zer got: "Min ji Pêxemberê Xweda wisa heskir: "Ê ku xwe nisbetê xeyrî bavê xwe bike û zanibe ku ew ne bavê wî ye, kafir dibe. Û ê ku xwe nisbetê miletekî ku ne ji wa ye bike, bila xwe ji cihê xwe yê di cehenemê de re hazir bike." (*Buxarî*)

15- Hevalê kutu qenciyâ wî dixwazî, lê ew qenciyâ te naxwaze, ti xêr di hevaltiya wî de tuneye.

(*Deylemî, ji Enes Ibn Malik*)

MUXBEÇEYÊN MEYFIRÛŞ HER SEHERÎ TÊN SEMA

Muxbeçeyên meyfirûş her seherî têن sema
Bade xoran nûşı nûş mane li dorê cema

Hin gulî bû enber in hin di şêrîn esmer in
Hin guherî dane yin misli Suheylî sema

Hin zerî ne pur sir in ser bi per in dîm dur in
Min ku di çerxê we dî sebr û qerarim nema

Sebr û qerarim ku bir can û ceger hûr dikir
Zilmî we reng kî dikir can dibir û dil teba

Can û dilê min ew e hûriweşê min ew e
Padişehê min ew e ez li derî wî geda

Yarî ku dî em geda desti bi desti me da
Em bi semayê birin reqs û sema jî we ma

Gote me durdaneyî em jî te û tu j'me yî
Lew bi heqîqet yek in mesele bê şubhe ma

Da me bi destê sıfî cama ji rengê durî
Cezbe giha can û dil pirr şewişandin hema

Bade minûşî ji dest çûme ji xwe mame mest
Qitre bi behrê giha behri bi eyni xwe ma

Gûşî bi amî mede terki medamî mede
Ekseruhum fî xuma exlebuhum fî ema

Herfi ji yek bûne fesl ger bibirî wan bi esl
Herfi dibit yek xetek xet ku nema nuqte ma

Wehdeti mutleq Mela nûr e di qelban cela
Zori di vî meselî ehli dilan şubhe ma

Mela Ehmed ê Cizîrî

LÊPIRSÎNA “PIRSGIRÊKA KURDAN”

Me bi nêta tesbîtkirin û weşandina ray, raman û pêşniyarên sazûmanan û zana û rewşenbîran di heqê “Pirsgirêka Kurdan” de lêpirsînek rêk xistiye. Em dê di vê hejmara xwe de bersîvên çar rewşenbîrên hêja; **M. İhsan Arslan** (Serokê **Komela Piştgîrî** Ji bona Mafêن Mirov û Mazlûman, MAZLUM-DER); **Firat Cewerî** (Xwedî û Berpirsiyarê Giştî yê kovara Nûdem); **Yılmaz Çamlıbel** (Sekreterê Giştî yê Weqfa Maf û Azadiyêن Kurdan, Kürt Hak ve Özgürlükler Vakfı) û **Atasoy Müftüoğlu** (Nivîskar), biweşînin. **Atasoy Müftüoğlu** ji ber ku bi Kurdî nizane, bersîva xwe bi Tirkî rêkir; birayê me **Hozan Oflaz**, metna bersîva wî wergerande Kurdî. Dê lêpirsîna me di hejmarê me yên hatî de jî dom bike înşaelah.

PIRSIYARÊN LÊPIRSÎNA ME:

- 1- Ray û ramana te di heqê “Pirsgirêka Kurdan” de çi ye?
- 2- Ji bona hel û fesilkirina vê pirsgirêkê pêşniyarên te çi ne?

Serokê "Komela Piştgîrî Ji bona Mafêñ
Mirov û Mazlûman" (Mazlum-Der)
M. İHSAN ARSLAN:

"PIRSGIRÊKA KURDAN" PIRSGIRÊKA UMMETA ÎSLAMÊ YE.

1) "Pirsgirêk" ci ye? Kurd çima bûne pirgirêk? Kurd ji kengî de bûne pirsgirêk? Ya jî Kurd ji bona kî pirsgirêk in?

Em dikarin der heqê vê piri-siyarê de çend sualê din jî bi-pirsin. Lakîn pirsîn rihet e, lê cewab dayîn zor e. Bi vê munasabetê ez dixwazim çend gotinê Kurt bibêjim.

Çi weqtê ku li vî memleketî serok û sultanan ji heq û adaletê dûr bûne, gelek pirsgirêk çêbûne. Di van pirsgirêkan da, ya mezin, a Kurdan bûye. Heger ku serokê Tîrkiyê bikarîbûna bigotina "Qiyama Kurdan" ya jî "Serhildana Kurdan" wê kelîma "pirsgirêkê" ne şuxulandina. Çunkî kelîmîn "qiymâ"

û "serhildan" bi şan û şeref in. Van gotinan ji Kurdan ra layiq ne dîtine. Tişkî nabe. Ji xwe heta ana navê me û paşnavê me û navê gundê me jî wan danî bûn. Ana jî "pirsgirêk" bi Kurdan ve zeliqandine. Dibêñ "Kürt Sorunu". Heta ana, welew bi "sorun" jî be ne di-gotin "Kürt" lê îdî di radyo-televîzyonan de bahsa Kurdan dikin, ev jî baş e...

Hayê min jê heye ku pêşîya cevaba min si-

vik bû. Ez dizanim ciwanên me û hetta em gişt jî baş nizanin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Ji vê bûnê ez naxwazim kûr û dirêj bikim.

Ku tête gotin "Kürt Sorunu", feqet PKK tête bîra hineka. Di nezera min de ev ne rast e û pir jî xeternak e. Lewra ew weqtê ku PKK tinebû jî Kurd hebûn û wê pişî PKK jî hebin. Ne ku ez van hereketên paşîn piçûk dibînim. Lakîn gereke bêzanîn ku, ji her cihetî de PKK, yan yek cemaetikî dinê, bi serê xwe nikare vî milletî "temsîl" bike.

Dixwazim bibêjim ku; sebebê vê pirsgirêkê û babê wê, sîstema Kemalîzmê û paşê jî zilm û bê edaletiya serokên Cumhuriyetê ye.

2) Weke ku ez dizanim "Pirsgirêka Kurdan", "pirsgirêka Ummeta Îslamê" ye. Hetta ku hel û fesil-kirina Ummeta Îslamê ne be, ne Kurd û ne Tîrk û hetta ne Ereb azad nabin û ji bindestî û zilma Xerb û Xerbiyan xelas nabin. Ba-xusus ev qernê paşîn de qewmê Kurd û Tîrk û Ereb yanê her ci qewmîn ku li Rojhilata Navîn hene, tev mazlûm û mustaz'ef in.

Yeqîniya min pê ewe ku he-ta dewra Kemal (Cumhuriyeta ewil) li ser piya be, wê ev zîlm dewam bike. Di nav van şertan da ez nikarim pêşîyarêni piçûk û muweqet ji bona hel û fesil-kirina pirsgirêka Kurdan beyan bi-kim. Lakîn ez dikarim bi yeqîni bibêjim ku:

— Hel û fesla gelek pirsgirêkên xelqên mazlûm, dibin çadira Îslamê de heye.

— Hel û fesil di însanîyetê de û di biratiye de ye.

— Hel û fesil di hatîna haqê û di çûna batilê de ye.

Ez hêvîdarim ji bo xelasiya hemû xelqên mazlûm û mustaz'ef.

Ü daxwaza min, pî-rûzî û serfiraziya we ye.

M. İhsan Arslan



Xwedî û Berpirsiyarê Giştî yê kovara "Nûdem"
FIRAT CEWERÎ:

"JI AVAKIRINA CUMHÛRIYETA TIRKIYÊ Û BI VIR DE HEMÛ MAFÊN GELÊ KURD HATINE QEDEXEKIRIN."

Dostên hêja,
Ger hûn destûr bidin, ez ê
herdu pirsên we bi bersivek kurt
biversivînim.

"Pirsgirêka Kurdan": Di
vê sedsala me ya bîs-
tan de hebûna pirs-
girêkek wilo ji bo hemû din-
yayê, ji bo hemû mirovantiyê
rûreşiyek e. Çawa dibe ku mile-
tekî xwediyyê nifûseke 20 mil-
yon, bê dewlet be? Dev ji dew-
letê berde, ji hemû mafên miro-
vantiyê bêpar be? Kultura wî,
zimanê wî, toreya wî qedexe be?
Miletekî xwediyyê ewçend dew-
lemendiyên kultûrî, xwediyyê
ewçend medeniyetên kevnar,
bête înakir kirin?

Ji avakirina Cumhûriyeta Tir-
kiyê û bi vir de hemû mafên
gelê Kurd hatine qedexekirin,
bi sedhezaran Kurd bi me-
tod û awayên cihê hatine
kuştin, bi şexsiyeta neteweya
Kurd hatiye leyistin; digel ku
ev ne bes be, tirs û xofeke
nemirovane berdane ser gelê
Kurd, jiyan li wan heriman-
dine.

Ji bo çi evqas zilm û stem?
Ev hovîtiya nemirovane ji bo
çi? Wê heyâ kengî ev polîti-
kaya nemirovane li ser gelê
Kurd dom bike?

Lê ger em bala xwe bi-
dinê, digel vê zilm û zorê jî
dîsan gelê Kurd ji bo biratiya

herdu gelan bi dengê bilind
bang dike.

Edî dem hatiye, ya rastî, ji zû
ve buhurî ye; divê "Pirsa Kur-
dan" an jî "Pirsgirêka Kurdan"
çareser bibe. Çima wê "Pirsgirêka Tirkân", ya "Farisan", ya
"Ereban", ya "Îngilîz û Almanan"
û hwd tune be, lê wê ya Kurdan
hebe? An jî ji bo çi wê miletekî
xwediyyê nifûseke evqas pirr; bi
ziman, bi kultur û dîrok, li ser
axa xwe biyaniyê xwe be? Ji bo
çi wê hinin nenas li ser wan ço
bihejînin? Na, ev pirsgirêka ha
divê rojekê berî rojekê çareser
bibe! Ger îro ev pirsgirêka ha
çareser nebe, wê sibe Firat û
Dîcle xwîn bikerikin, ji qîrîna
Cûdiyê serbilind, wê asman bi-
qelişin. Ji herdu hêlan, ji herdu

miletan wê bê hejmar mirovên
bê sûc û reben bêne kuştin. Wê
dayikên herdu hêlan di hêşirên
xwe de bifetisin. Kulîlîkên herdu
welatan wê biçilmisin. Gula ber-
biro wê berê xwe ji rokê bigu-
here, wê stûyê xwe yê xwar hê
xwartir bike. Erd û zeviyên me
yên bi ber, wê hew ber bidin.
Wê tenê tovê dijminatiyê di nav-
bera herdu gelan de hêşin were;
wê hêşin were û ber jî bide. Wê
ji yekê heftê, ji yekê sed bide.
Wê wilo bibe ku ji endamên
herdu miletan kî kê li ku bigire
dê wî/wê li wir temam bike.
Herçiqas em ne li Tirkîyê ne jî,
dîsan em nûçeyên vê neyartiya
ku dewlet û îdeolojiya resmî se-
beb e, dibihîzin. Ger îro li ba-
jarên Tirkîyê Tirk êrîşê dibin ser
Kurdan û wan bêpîrs diku-
jin, sibe wê Kurd jî eynî tişî
bikin, bi komik û grûb wê
bigirin ser Tirkân û wan bi-
kujin, malên wan wêran bi-
kin.

Lê, ji bo ku pêşî li vê yeka
han bête girtin, ji bo rawes-
tandina rijandina xwîna mi-
rovên bêsûc, ji bo pêşdexis-
tina herdu welatan û xweşki-
rina jiyana hevvelatiyê wan,
divê siyasetvanê Tirk dev ji
polîskayê kevin û kufukî
berdin û ji bo çareserkirina vê
pirsê di huzûra koma mile-
tan de bi Kurdan re rûnên.

Firat Cewerî



Sekreterê Giştî yê “Weqfa Maf û Azadiyên Kurdan”
YILMAZ ÇAMLIBEL:

“DIVE EM -JI YÊN İSLAMI BIGRE HETA YÊN MARKSİST- HEMU RÊXISTİNÊN WELATPARÊZ, LI SER MUŞTEREKÊN NETEWEYİ YEKİTİYEK SAZBIKIN.”

Dem ber bî qırna bist û
yekan bî lez dîmeşe. Lî
ser rûberê dinê xên ji
Kurdan û çend hevalbendên wi,
hemû li ser axa xwe serbixwe û
azad dijin.

Lê belê ev belengaziya gelê
Kurd, ne daxwaza wi bû. Ev
yen, bî bîyara kolonyalistan,
her wusa ji bî dest wan qewimi.

Iro dînyê de teknolojiya ge-
lek welat û netewan ewqas pêş
da çuye ku ew hîldiperikîne
stîrkan. Rûberê dinê têra wana
nake. Ev gel bî serbesti jiyana
xwe dîdominîn. Ew xwedi
hebûnên xwe yên netewi ne.
Di van welatan de mafêni
mîrovi, her wusa ji demokrati
pir pêş de çuye.

Kesêni ku lî van welatan
dijin bî serbesti dîkarin xe-
leyîn dewlet û hukumetan
bêjin. Her weha, ji bo dax-
waz û pêşniyarên xwe dîka-
rin bîcîvin, bîmeşin û bîbin
yek.

Rewşa wana iro ideal ne-
be ji, ewana diji xeletiyêñ
dewlet û hukumetên xwe, dî-
karin rîxistinân çêbîkîn û te-
koşina xwe bîmeşinîn. Teko-
şin şîk tîneye ku lî ser tesbit-
kirîna politika dewlet û hu-
kumetan de tasireki baş dîke.
Jî ber vê yekê ye ku, raya

gîsti ji rîvabûriya politika dew-
letan de cîheki gîring dîgre û
dewletan ji tiştên xîrab û nebaş
dîparêz e.

Ev yek prensiba demokra-
tiyê ye. Ya baş û xweş ew e ku
kesêni li van welatên demokra-
ti de dijin li ser jiyana xwe qet
ne bêxwedi heq û bîryar in.

Lê mixabe, gelê Kurd qırna
bistan de ji bindestê kolonya-
listan de dinale. Dî vê dînya
hev dem(!) û modern(!) de hê-
nîkare bî zmanê xwe yên netewi
qîse bike, stran bêje, bîxwine û

bînivisine. Gelê Kurd bî destê
zorê bî zmanê kolonyalistan va
qise dîke, dîxwîne û dinivisine.


Iro li Kurdistanê xên ji van,
gelê Kurd dî bin terora kolon-
yalista de dinale û dî xwîna sor
de dîxenîqe.

Bî kurti, bo gelê Kurd, jîyan
ji êdi qedexe ye. Lewra ew êdî
azadi û rîzgari dîxwaze. Vê
zîlmê ra dîbêje bes.

Kurdistan berê ji yalê İmparatoriya
Osmani de û İmparatoriya Iran de bû du parçê. Paşê
ji qırna bistan de yalê Turkiyê,
Iranê, Iraqê û Sûriyê hat par-
vekirin û bû çar perçê.

Kurdistan, ji parvekirîna
yekem virde koloniye klasik
e. Ew wê rojê virde hertim di
bîn zîlm û zora kolonyalistan
de ye.

Hebûnên me yên rûberû
û yên bîn ax her tim ji yalê
van dewletan ve hat talankirîn.
Zîmanê me yê dayiki,
çanda me ya bî bînyat û
dewlemend hat qedexekirin.
Her wusa ji hebûna gelê
Kurd hat încar kîrin. Niyeta
wan ev bu ku gelê Kurd di
navbera xwe de bîhelinin,
asimile bîkîn û jî holê rakîn.
Bo pêkanina vê hovitiya xwe
ji dî gel politikayêñ asimi-
lesyonî û inkari, wana dî di-



rokê de gelek cara bî ser gelê Kurd jenosid û qetliam çêkirin.

Lê belê agirê ku Kawa vêxistibû her tim dilê me geş kır û riya me roni kır. Temirandina vi agiri tişteki hêsan nebû.

Dirok ji şahide ku gelê Kurd ji qırna 19 an virde gelek cara serhilda. Mixabe hînek cara ji xeletiyên me, hînek caran ji kêmfirsendiyên dijmin, serkeftün pêk nehat. Dî gel van derheqan, konjonktura dînê ji dest nedida ku gelê Kurd rizgar bibe.

Îro em bala xwe didinê rewşa dînê ne mina berê ye. Pîrsa Kurdi, bîrina heri mezîn a Rojhilata Navin e. Pîsti buyerên van salan de Pîrsa Kurdi êdi di rojeva dînê de cîheki gîring gîrtiye. Bîbe nebe dînya êdi mecbure ku safikirina vê pîrsê de cih bigre.

Her wusa ji gelê Kurd hemu caran zêtir li piya ye û azadiya xwe bî dîl û can dixwaze. Jî yalê dîn gelê Kurd iro gavêne wek Kurdistanâna Başur avêtiye. Li hemû perçen Kurdistanê de daxwaza azadi û serkwebûnê pîrr xwîrt e. Bî bawerîya me kîmasiya yekitîyê nebe, gelê me wê demek kurt de bigihijê azadiya xwe.

Jî bo vê yekê ji dîve em -ji yên islami bigre heta yên marksist-hemu rîxistinê welatparêz li ser muşterekê neteweyi yekitiyek sazbîkin. Lê belê heger em li ser xeleti û şâşîyan bîmesin; dijiti, dijmini û birakuji berdewam be, şerê azadiyê naçe seri û ev yek ji bo êriş û çalakiyên dijmin hêsanîyek mezîn e. "Jî kolonyalistan re masigir, ji xwe re ji kûsigir bin." Jî ber ku hemû caran pirtir hewcîyê yekiti ye. Divê em êdi bibin yek û vê fîrsenda konjonktûra iroyin ji bo mafê xwe yên neteweyi baş bixebeitinîn.

Tê zanîn ku dînya iro mine dewra berê li ser du qampa runeniştiye. Pîsti belavbûna Sovyeta Yekbûyi, di dînyê de gelek

guhertün çêbûn. Rojeva raya gîsti ya dînyê êdi bi tiştên baş û nûti ji ye.

Perspektifa dînyê êdi li ser mafêni mirovi, demokrati û her wusa ji li ser azadi dîmeşe. Şik tuneye ku ev perspektif bî self determinasyonê ve hevgirêdayi ye. Dînya hemû li ser vê rîcê pêşde dice. Lê mîkabe Türkiye paş de dice. Ew xwina gelê Kurd dirjine û cav lê ye ku daxwazên me yên insani, çandi, demokrati, her wusa ji neteweyi, bî terorê bifetisine.

Lê ev tewra, tewreke xelet e. Ev yek wê problemên mezîn li serê wi veke. "Ewê here heyfa bavo, a dayê bîde ser." Em nu-

"Dîvê em pîştgiriya gelê Türk hildîne pîst xwe, da ku dijmin bîkeve tengashiyê."

ha ve dibêjin, dîvê Türkiye dev ji vê yekê berde. Ev serhişki wê serê wi bîxwe. Lewra diroka mirovin bî van nimuneyan tiji ye. Mirov gelek cara ev tewra cerîbandiye. Dawiyê de ji tu keşi xêrek jê nediti ye.

Ev yek ne tenê ji bo me, her wusa ji bo gelê Türk, Ereb û Farris ji problemeke mezîn e. Hukumetê çar dewletan ji devêne xebatkar û gelê xwe yen kedkar dîbirin û li ser perçen Kurdistanê militarizmê dışının. Xen ji vê, wana ji bo vê pîrsgrêkê her tim gedexe anine ser raman û bîyarêne gel û demokrati feti-sandine. Jî bo vê yekê ye ku problema me ya wan gelan ve hîşke-hîşk bî hevdûva girêdayi ye. Divê ev gelan ji pê bîdin ser stûyê dewleta xwe, de ku ev pîrsgrêk ji holê rabe.

Îro problema Kurdistanê azadi ye, ya Türkiye ji demokrati ye. Ev tesbit û formilasyon ji bo me gîring e. Bî bîyara me,

him federesyon, him ji dewleteki cûda li ser serxwebûnê rûdînên. Ewê gori daxwaza gelê Kurd ava be.

Bî raya me Pîrsa Kurdi wê di her perçeyi de cûda cûda safi bîbe, wek Kurdistanâna Başur. Lewra zîrûfîn hemû perçeyan ne wek hev in û dewletên kolonyalist wek xençereki sinor kişandine nava dîlê Kurdistanê. Çuyin-hatîn û pewendi gelek zehmet e. Jî ali din dîvê em tekoşinê di çar perçan de ne weke hev in.

Jî bo Kurdistanê dive em hemû kes û rîxistinê gelê Kurd bîkin yek û çalakiyên dijmin vala derxin. Jî ali din dîvê em pîştgiriya gelê Türk hildîne pîst xwe, da ku dijmin bîkeve tengashiyê.

Gori me, zû ye ne dereng e. Dive dewleta Türk beri her tişti dev ji terorê berde.

Rambojen xwe (timen taybeti) û parêzkarêne gundan (korucu) belav bîke. Qedexên li ser çapemeniya Kurdi bîn ra-kirin. Zmanê Kurdi dî dîbistan, radyo, televizyon û hemû ciyan serbest bîbe. Gîrtiyêni siyasi bîn berdan. Hemu parti û rîxistinê gelê Kurd bî eşkere xebatên xwe yê siyasi bîkin.

Ev gavêne gîring û yên weke vana ji bo azadiya Kurdistanê û demokratiya Türkiye gavêne heri pêşin in.

Ger ku ev gav bîn avêtin wê rewşa siyasi gelek zelal be û wê dijiti û dijminati sist bîbe. Ya heri gîring ji, vê rewşa zelal de wê riya aqil vebe. Evana gavêne pêşin in. Lê belê ji bo vekirina Pîrsgrêka Kurdi ev tenê ne bes in. Dî gel vana peyre ji dîvê mafê çarenûsi yên gelê Kurd, bêşert û surt were nasin.

Xen ji vê metodê tu metod ji bo pîrsgrêkê resyonel nine. Lewra daxwaza gelê Kurd, Kurdistanâneke azad û demokrat e.

Yılmaz Çamlıbel

Nivîskar

ATASOY MÜFTÜOĞLU:

"MEN KIRINA GELEKÎ JI ŞTEXALIYA BI ZIMANÊ XWE, TİŞTEKE NEHATIYE DÎTIN Û NEHATIYE BIHÎSTIN E."

1) "Pirsgirêka Kurdan" ne pirsgirêka iro ye. "Pirgirêka Kurdan" bi şiklê pirsgirêkeke netewî, ditaliya Împeretoriya Osmanî de, hate holê. Di qirnê 19'an de Kurdan li ber hakimiyeta Osmanî gelek caran ser hil-dan û ev serhildan gelek salan dom kirin. Kurdistan weke ku iro hatiye îhmalkirin, doh jî wisa hatibû îhmalkirin. Gerîna li huwiyeta xwe ya netewiya Kurdan û rizgarîxwaziya wan, di her demê de elaqeya emperialistan bi aliyê xwe de kışandîye.

Di dema belavbûna Împeretoriya Osmanî de, mewcûdiyeta Kurd jî perçe perçe bû. Pişti vê perçebûna mezin, Pirsgirêka Kurdan di cihê xwe de û di mintiqê de, ji pirsgirêkbûnê derketibû. Emperialistan tim xwestin ku ji bona pêk anîna siyasetê xwe yên herêmî, ji unsurên Kurd istifade bikin û wan bikin aletê siyaseta xwe ya nufûzî. Lîbelê wezi-

yeta Kurdêne Tirkîyê, Îran, Iraq, Sûriyê û deverên din, tim ji istîsmarê re musaid bû.


Bi baweriya min, di nav xwestinê berê yên Kurdan û xwestinê wan ên iro ferqek zêde tineye. Kurd di qirnên 18, 19 û 20 de bi her wesîlê xwestin ku şertên ku tê de dijin, rast bibin, baş bibin û bi şiklekî insanî der bê. Ev xwest, ne xwestinê nayin pêk anîn bûn. Pêk anîna van xwestinan, tiştek hêsan bû. Lîbelê digel vê qasê ku ji ser ve sedsalan buhurîne, hê jî

ev xwestinê Kurdan nehati-ne cih.

Mesûle hemû çelqînê mintiqê yên tarîxa nêzîk, bi gelemerî emperialîzma Xerb e. Tixûbênen sünî, avayıyîn sünî û dewletên sünî, pirs-girêkê mintiqê hê jî kûr kîrine.

Mewcûdiyeta Kurd a perçekirî, di her dewletê de, zêdetir di mintiqen beyar û şepal de, bi hemû şertên paşdemayînê rûbirû û di feqîrî, betalî, bêxwêşîtî û bi dil û xeyal şkestîbûnê de jiya.

Hemû civatên etnîk, ji ciheta kulturî, xwe ji yên din cuda dibînin. Her grûbeke etnîk, xwe di niyaz û ihtiyaca iftixarkirin bi qîmeten xwe his dike. Evan tiştine tebîne. Her grûbeke etnîk dixebite ku li ser kultureke xasê xwe rûne û bi wê kulturê pal bide. Islam xusûsiyet û keyfiyetê tebîne yên civatên etnîk, qebûl dike. Ev civatên etnîk, zêdetir xwe bi zimanê xwe tarîf dikin.



Rejîma Cumhuriyeta Tirkîyê, ji tarîxa sazbûna xwe û pê de xwestiye ku ziman û kultura Kurdan idare bike. Loma Kurd nikarîn xwe bi ziman û kultura xwe ifade bikin. Li gelê Kurdistanê, siyaseta çetirbûn û bilindtirbûna Tirkan, hate barkirin. Ziman û kultura Tirkî hate barkirin. Klîşeyên “Ne Mutlu Türküm Diyene” (:“Xweş bi halê yê ku bibêje ez Tirk im”) li her derî Kurdistanê hatin nivisandin. Loma ji muxalefeta Kurd a îro, zêdetîr, şowenîmma Tirk mesûl e. Rejîma Cumhuriyeta Tirkîyê heta van nêzîkan heqîqeta Kurdan qebûl nedikir. Bi zimanê Kurdi ştexalîn qedexe bû, hetta bikaranîna kelîma “Kurd” jî qedexe bû. Men kirina gelekî ji ştexaliya bi zimanê xwe, tişteke nehatiye dîtin û nehatiye bihîstin e. Mewcûdiyeta Kurd, tim î tim di bin sansûra dewletê de jiyaye.

2) Gelên ku nikarîn xwe azadane ifade bikin û di bin barê bindestiyê de jiyidan, muxalefeta xwe ya li hemberê hakimên zordar di hemû mudesta tarîxê de kom kirin û wextê ku fîrsend kete destê wan, muxalefeta xwe bi şikleki, nîşan dan.

Di Tirkîyê de heta van rojên ku em tê de dijin, di mewzûya behsa Pirsgirêka Kurdan de navendî û haleke bêqeyd û bêqedexe nebû. Dewlet di vê mewzuyê de bi hemuyê me fîkr û dîtinê xwe, bar dikir. Di heqê vê pirsgirêkê de pirr heqîqet di hatin veşartin. Misliman jî, weke ku di gelek tiştan de kîrine, di vê meselê de jî bi gelemperiyeke zêde, tiştê ku

dewlet di heqê Pirsgirêka Kurdan de gotiye, qebûl kiriñe. Misliman, weke di gelek tiştan de, di mewzûya Pirsgirêka Kurdan de jî pirr dereng ştexilîne û piştî gelek kesan ştexilîne.

Pirsgirêka Kurdan bê bikarbîrina zorê, karibû hel bibe. Lê ez di endîşê de me ku di van rojên ku em tê de ne û di hatiyeke nêzîk de, di vê meselê de dê hel û fesil nebûn û nemalûmbûn hê jî dom bike.

“Bi însanan li gor eslê et-nîkê wan muamelekirin, xeyrî-însanî ye, ji însaniyetê bidûr e.”

Mixabin îro hemû siyaset li ser pragmatîzma netewiyê têne teşkîkirin. Paragmatîzma netewî cih nadî qîmetenî însanî û axlaqî. Hedef û armanca İslâmî, teşkîkirina siyasetenî avakirî li ser esasa fezîletê ye. İslâm heq dide gelan ku li ber neheqîyan bisekinin. İslâm qedexe kiriye ku gelek, heqaretê li gelê din bike û gelê din texfîf û tahqîr bike. Bi însanan li gor eslê etnîkê wan muamelekirin xeyrî-însanî ye, ji însaniyetê bidûr e. Dewleta adil mecbûre ku bê ferq êxistin di nav neteweyan de, hemû heqîn civatîn etnîk re di bin tamînatê de bigre û heqê wan bi wan bide.

Gereke ez itîraf û îqrar bi-

kim ku li min zehmet têt ku ez ji bona hel û fesilkirina Pirsgirêka Kurdan, çareyên politîkên şenber/pratîk/rassteqîne teklîf bikim. Lê ez bawerim ku gereke li Pirsgirêka Kurdan ne bi şiklê Pirsgirêka PKK were meyzandin. Ez dixwazim ku di vê cenga ku dom dike de, heqê kesen ku di ceng de bêteref in, gereke muhafize bibe û bi heqê wan rîayet û hurmet bibe. Ev muhîm e. Gereke ez bibêjim ku, heger mislimanen ku henûz azadiya siyasiya xwe bidest neanîne, ji bona Pirsgirêka Kurdan teklîfine siyasi bînin, baweriya tikesî bi wan teklîfan naye. Ez bawerim ku mesûliyetekî heyatî û muhîm li ber me mislimanan heye ku em karin wê di van rojên ku em tê de dijin, bi şiklekî şenber pêk bînin:

Wisa xuya dike ku îro Pirsgirêka Kurdan gehîştiye merhaleke pirr xeternak û hinin dixwazin ku ji vê zemîna psîkolojîk îstîfade bikin û dijminiyê têxin nav gelên Tirk û Kurd û agirê dijminetiye geş bikin. Li ber hev kirina van her du gelan û pêk hatina dijmineti di nav wan de, kare netîceyin pirr bi felaket bi xwe re bîne. Loma gereke em biraderiya her du gelan di famêla İslâmî de, bi jidîlî û îmaneke mezin mudafea bikin û ji bona men kirina her cûr pevçûnê, em pirr bixebeitin. Gereke em bi biraderiya İslamiya gelên Tirk û Kurd ji her wextî zêdetir ehemîyet bidin û di vê çarçivê de gereke em danûstandin û munâsabeten barwer teşkîl bikin.

**Atasoy Müftüoğlu
Jî Tirkî: Hozan Oflaz**

PIRSA KURDAN ÎSLAM HEL DIKE

*Yê ku rabe û bixwaze ji bo Pirsgirêka Kurdan
çarekê peyda bike, lêbelê İslamiyetê di vê
navberê de li ber çavan negre,
berî her tiştî, xwe dixapîne.*

SÜLEYMAN ÇEVİK

Car dewletan welatê Kurdan nav xwe de par kirine. Kurd di welatê xwe de jiyanêke perîşanî didomînin. Welatê Kurdan îro yek tenê nîne; çar gul in û her gulek li aliyekî maye. Di navbera van gulan de, sînor kişandine, qûleyên leşke-ri çok kirine, têl danîne û mayîn veşartine. Ji bo ku Kurd îrtîbatê bi hevudu re daneynin jî çûyin û hatina van çar gulan ji Kurdan re qedexe kirine. Kesênu ku îrtîbata wan ji hev hatiye birîn jî, ji yek eşîrê ne, bav û law in, xal û xwarzî ne, zarokêne mamê hev in, birakê hev in.

Ev kesana bi xwestina dilê xwe ji hev neqetiyabûn. Ewêne ev xizmana ji hev qetandin jî, di vê meselê de ti cara fikrê Kurdan pirs nekirin. Kesî negot, "Ka Kurd ci dixwazin?"

Hinek însanan hat in gotin: "Ji vî alî derbasbûna aliyê din qedexe ye. Yê ku derbas be, wê ceza bixwe." Ewêne ku ji sînoran derbas bûn hatin kuştin, avêtin hepsan, ceza xwar in. Îdî Kurd nikarîbûn ji sînoran derbasbin. Bi vî şiklî îrtîbata Kurdan ji hev hat birîn.

Perçekirina welatê Kurdan ya cara pêşîn sala 1639 de ye. Dewleta Osmanî û Safewiyên Iranê di wê salê de li Qesra Sêrîn rûnişt in welatê Kurdan di

nav hîev de par kirin. Ji wê salê sun ve Kurd hinek li nav Safewiyên Iran, hinek jî li nav dewleta Osmaniyan man. Pirr caran jî hem Safewiyan, hem jî Osmaniyan Kurd dan pêsiya xwe û bi-hev re cengen dirêj kirin. Navberê de Kurd hatin kuştin, ji welatê xwe derketin, koçber bûn. Hêsisîr û koletî bû qeder û dîroka Kurdan...

Mîna ku tê zanîn, piştî Cenga Cîhaniya Yekem jî dewleta Tirkî ava bû. Fransiyen û İngîlîsan Iraq û Surî ji hev qetandin. Iraq ket bin bandûra İngîlîsan, Surî ji ket bin bandûra Fransiyen. (Ev herdu dewleten dagirkêr, piştî Cenga Cîhaniya Yekem bi konferansa Sykes-Pîcot, Rojhilata Navîn di nav hev de par kiri-bûn.)

Piştî çend sal şun ve Iraq, sala 1936'an û Surî jî sala 1946'an de azad bûn. Çar dewletan welatê Kurdan kirin bin bandûra xwe. Kurd di welatê xwe de hêsisîr, xerîb û mahzûn, perîşan û bêkes man.

Gul kirin çar perçe. Çar perçen gulê bi çar aliyan ve belav kirin. Di nevberê de dirik çik kirin. Perçen gulê ji hev dûr ketin.

Li Tirkîyê çiqas mirovên bêçare û acîz û belangaz û xizan hene, ma bi piranî ne Kardin? Li Stenbolê ez piyasa Bayezid, Sîrkecî û Emînonû û hwd digerim

û dinihêrim; hemalê van deran tev Kurd in. Ko li cihek înceatek heye, dîsa ez lê dinihêrim; yê ku li wir dişuxulin bi piranî Kurd in. Çiqas karên giran hene, xebatkarê wan dîsa bi piranî Kurd in... Bi piranî, dibêjim. Ne ku ji xelqêne din tinene... Divê em li ser bifikirin: Ev tiştîne nebaş, cîma tim li ser piştâ me ne û jî me re bar in?

Sultan Ebdilhemîd bi hinek axa û begêne Kurda re heq û deman (:îmtîyaz) da û wan kesana li piştâ gelê Kurd siwar bûn. Ku kî li hemberê dewleta Osmaniyan serî rakir, evan bûn parêzkerê Dewleta Osmaniyan li ber wan. Ji van kesen demangêr re gotin "Paşayê Hemîdfî". Navêne xwe ji Ebdilhemîd standibûn. Van paşan mal û milkê xelqê bi zorê ji wan standin. Mehkeme û hepsîn xususî ji xwe re vekiribûn. Kesênu ku serî radikirin, yan beyhûde û bê sebeb dikuştin, yan jî davêtin van hepsan.

Kurd û Tirkân bi hev re Cumhuriyeta Tirkîyê ava kirin. Herdu xelqan, dewleten kafir der kirin. Piştî vê demê Mistefa Kemal hakimiyet xist destê xwe û ci bû ji vê sun ve bû: Navê Kurdan, ziman û çanda wan û hemû heqê mirovoiyê wan hatin încar kirin... Gotin: "Kurd tinene, Kurd Tirk in, zimanê wan tineye. Di vî welaş de yek xelq û yek ziman heye: Ew xelqa

Tirk in û ziman jî Tirkî ye." Kurdan, ev heqaret û înkariya bênsaf qebûl nekirin, serî rakirin, bi Şêx Seîd ve dest pê kir û li çar hêlên welatê Kurdan serhildan çêbûn. Ev serhildanan tev bi xwîn û zilmê hatin vemirandin. Mirovên serdest ya îdam kirin, ya jî koçber kirin. Rejîma Kemalîst qanûna koçberiyê derxist û bi hezaran Kurd koçberî rojava kir.

Di welatê Kurdan de, çemê xwînê herikîn, newal bi laşen mirovan tijî bûn. Bîhna bârûtê, dengê topân û awaz û qîrînên mazlûman ji vî welatî qet kêm nebûn.

Zimanê

Kurdan qedexe bû. Çand û huna Kurdan ji holê rakirin. Tirk stranê Kurdi, muzîka Kurdi girtin, gotinê Tirkî lê anîn û kirin malê xwe. Li efsanên Kurdi, govend û çirokêne Kurdan xwedî derketin, ew jî kirin malê xwe. Em bê ziman, lal û kerr di holê de xax û pêrifsan û pergende bûn.

Di navbera 1923 û 1950 de li Tirkîye idare di destê Mistefê Kemal û İsmetî bavê Erdal de ye. Zilm û zordariya li ser Kurdan, Tirkan û xelqên din di vê dewrê de dom kiriye. Lewra rejîma Kemalîst li dijî İslamiyetê bû. Tiştê ku bi navê İslâmî ye hemû rakirin, talankirin û winda kirin. Mizgeft hemû kirin axur, medrese kilît kirin, hukmê Qur'anê rakirin û xwendina Qur'anê qedexe kirin, ezan ver-

gerandin Tirkî. Yê ku bi vî şiklî ezan nexwendin, cezayê tewr dijwar xwarin. Çiqas qîmetên İslâmî hene, jê re bûn dijmin û tev rakirin.

Seyda, şêx, zana, rewşenbîr û hwd, tev yan avêtin hepsê, yan kuşt in, yan jî koçber kirin...

Piştî sala 1950'yi jî, asîmîle kirina Kurdan dest pê kiriye. Ji

û Kurdi li zarokên xwe bike. Ev tetbîqata ku li rûyê erdê hîna kesî nekiriye, li Tirkîye kirin.

İslamiyet bi şiklê ku di jiyanâ Kurdan de cih girtiye, di jiyanâ ti mileti de ewqas cih negirtiye. Kurdan her dem ji bo dînê heq cehd û xebat kirine. Wextê İslâm di jiyanâ wan de kêm bûye jî, dîsa dilê wan, tim

ji dinê heq re vekiribûye. Hurmeta wan tim ji İslâm re hebûye.

Yê ku rabe û bixwaze ji bo Pirsgirêka Kurdan çarekê peyda bike, lêbelê İslamiyetê di vê navberê de liber çavan negre, berî her tiştî, xwe dixapîne. Ev, Pirsgirêka Kurdan hîn

jî zêdetir muşkil dike.

Dewra Dewleta Osmaniyan, salêni dawîyan de Seyda Seîdê Norsî bûyereke ku hatiye serê xwe dibêje: "Mirovin li Beytişbabê li hemberê dewletê ser hilâda bûn. Ez çûm cem wan, min go: "Hun ci dixwazîn?" Ji min re gotin: "Qaymeqamê me nimêj nake!" Ev kesen ku jî nimêjne-kirina qaymeqam gazin dikirin, bi xwe jî nimêj nedikirin. Lêbelê amîren nimêjkir dixwestin."

Navbera Kurdên berê û yê iro de ferqek zêde tineye. Bi piranî Kurd dîsa İslâmî dixwazîn. Ji mislimanê rast û heqperest re dilê wan dîsa vekiriye.

Birîna Kurdan ji xeynî İslâmî ti tişt nikare derman bike. Lewra Kurd misliman in. Bila vêya hemû kes bizanibin! Bi vê sebebê hemû ideolojiyên ku dijê



bo ku ziman û çanda Kurdan bidin jîbir kirin, asîmîlasyona Kurdan derxistin holê.

Piştî sala 1960'ı jî hinek sazûman ava bûn. Ew sazûmanana ziman û çand û dîroka Kurdan çewt nîşan dan. Ji rastiyê derxistin. Kitêb derxistin û belaş belav kirin. Di kitêbên xwe de Kurdan, Tirk nîşan didan. Ziman û hemû adetên folklorîk înkâr dikirin û bi Tirkan ve girê didan. Ti medeniyetek Kurdan nîşan nedidan. Dema ku Kurdan ev kitêbana bixwendina û dîroka xwe nîzanîbûna, ji xwe fedî dikirin...

Piştî 12'ê Îlonê navê gundêñ welatê Kurdan hemû guherandin. Navê Tirkî li wan kirin. Gund bûn bi du nav: Yek bi Tirkî, yek jî bi Kurdi.

Nehîştin ku kes navêni İslâmî

Îslamê ne, nikarin ji Kurdan re
bibin çare.

Mirov goşt bide ber ga, giya
jî bide ber şêr ci tiştekî xerîb e,
ne wisa? Ji şêr re goşt, ji ga re gi-
ya, mutabiqê fitreta wan e.

Îro jî, ji Pirsgirêka Kurdan re
ençax Îslam çare ye. Em bi
fikrên ku mutabiqê fitreta însan
nînin, nikarin vê meselê hel bikin.
Bi rastî di nava vê sîstemê
de Pirsgirêka Kurdan tenê ne, ya
Tirkan û xelqên din jî hel nabe.
Di mudeteke kin de, Kurd xwe
bikaribin ifade bikin, ew jî baş e.
Madem serê Tirkan jî bi sîstemê
re xweş nîne, divê em bi wan re
pevxebatê bikin û bikevin di-
yalogê. Lewra vê pirsgirêkê en-
cax em bi hev re karin hel bikin.

Pirsgirêka Kurdan işê deh sa-
lan nîne. Ji dewra ku Cumhuri-
yeta Tirkî ava bûye vir de, ev
kul heye. Ji vê pirsê mezintir ti
derd ji bo Tirkiyê tineye.

Bi kurtasî, ji bo ku Pirsgirêka
Kurdan hel bibe, divê di ze-
manekî kin de ev tiştana bêñ
cih:

Ziman û çanda Kurdî divê
serbest be. Xwendegeh vebin.
Bi televîzyonê Kurdî biweşînîn.
Kitêb, kovar û rojname bi ser-
bestî derkevin û azadane belav
bibin.

Mîna ku Seîdê Norsî heştê
sal berê xwestiye, lazime li Kur-
distanê zanîngeh û xwendegeh
vebin. Seyda Seîdê Norsî wê
dewrê li Wanê zanîngehek, li sê
deverê din ên Kurdistanê jî, sê
xwendegehê herêmî xwestîne.
Li gor wê dewrê, ev ihtiyyaca
Kurdan tanî cih. Lîbelê malû-
me ku îro yek zanîngeh û sê
xwendegehê herêmî ne besî
Kurdan in. Divê zêdetir bin. Di
zanîngehan de wê ilmê Îslamî û
fennî bi hev re bêñ xwendin.
Wê bi sê zimana jî talîmê bikin:
Erebî, Tirkî û Kurdî... Wê di
xwendegehê herêmî de jî,
xwerû bi zimane Kurdî talîmê
bikin.

Dû re ci xwestin hebin, zaten
wê bêñ meydanê...

LI SER WEFATA BEDÎUZEMAN SEÎD Û NORSÎ

Ey dilê meskenê derda, ma tu zanî ku çibî
Ew Seîd ê can feda j'dînê me ra, j'kîsê me bî

Beyreqa ku wî hilanî ji bo vî dînê mubîn
Me çiqa pirsî û sehkir vê demê kes dê nebî

Çira dîn girtibû, bakî ji kesekê ne dikir
Heq dizanî heq digot û heq dikir her dem webî

Ew dikana ku wî danî, ew metaê difirot
Ew li Şam û Misr û Bexda'yê niha peyda nebî

Çû wefat kir ci musîbet sed hezar rehmet li ser
J'ehlê vî dînê mubîn re, ci nimûnek teze bî

Sê sed û heftî û neh piştî hezarê hîcretê ⁽¹⁾
Dergehê baxê bihişa kerem, li ber wî vebî

Ew li Nors'ê hate dinya û li Riha wefat kir
Ew şehîr bû ew bedî' bû ez ci bêm ser deste bî

Ey Seîd, her du dinya dîtina te bû keder
Em j'Xweda'yî dixwazin, l'axretê li cem te bî

Ey Elî! gerçi Seîd çû, lê Rîsalê Nûr neçûn
Sed emanet min li te ku tu ji wan mahrûm nebî

(1) 1379 hicrî.

Seyid Elî yê Findikî

NAMEYÊN BÊCEWAB / 3

22 Çileya Paşîn 1991

Helbestê mi bêcewab dimînin xeylî wext e
 Dibe ku nagihin destê te nameyên biteahudê mi
 Heyf e ku ez dengê rengan nabihîsim
 Hê nikarin dengan jî bibînin çavê mi

Tu mi mîna teyrê koçer nehesibîne yên ku riya xwe bi xwe
 peyda dîkin
 Ez li vir im bi teyrê ehlî re, yên mahkûmê vî bajarî
 Tu mi feryadvan jî nehesibîne êdî ez betilîm
 Tu mi têkoşînvan nehesibîne qehreman nehesibîne jiyandar
 nehesibîne

Mi dilê xwe li ber derî hiştiye, kartek li ser singa min e
 ezman reng
 Ezman tineye êdî her aliyem dîwar ji vî derî bi wî derî
 Tu mi çeperker jî nehesibîne ji derive'z bêxeber im
 Êdî ji diyerê te name jî nagihin destê mi

Banqê hêstiran li vir vebûn tu nizanî
 Fayiza mewduata bilind e heta tu bixwazî
 Dibe ku rojek çemê hêstiran ji zikakan biherikin
 Ko karbidestê me destê xwe sivik negrin û îhaleyê nû
 venekin

Li vir soz bêwade ne zivistan bêwade ye tu nizanî
 Kartika bêwadetiyê umêdan dihelîne heta tu bixwazî
 Û tu mi hê nehesibîne ku ez dengê rengan dibihîsim
 Û çavê mi nikarin dengan bibînin hê jî

Sabah Kara

KOVAREKE DELAL Î KURDÎ: NÛDEM

ROJÎN ZELAL

Nûdem kovareke hunerî, edebî û çandiya delal î me ye ku ji terefê rewşenbîrine Kurd, her sê mehan carkî, yanê bi şiklê fesilnamê li Swêd (Isveç) ê bi zimanek ze-lal tête weşandin. Heta nuha sê hejmara wê derhatine û hejmara çaremîn, dê van nêzîkan biweše.

Xwedî û berpirsiyarê giştiyê Nûdem Mîrza Fîrat Cewerî, di hejmara ewil de meqseda weşandina vê kovara delal, wusa ïzah dike:

“Her çiqas di navbera van salan de kovarin Kurdi yên hêja û bi qîmet derketin jî, dîsan ew kovara ku di bîr û hizra me de bû, ku hemêza wê ji hemû hunerwend û nivîskarêne Kurd re vekirîbe, derneket. Bi armanc û hêviya dagirtina wê valahiyê me xwest em li arşîv û pirtûkxana Kurdi berhemek din jî zêde bikin. Wek tê zanîn ev kovar ne ya pêşî ye û ne jî wê bibe ya dawî. Lê wê bixwaze di vê govenda ku diherike de bibe serkêş. Armanca wê a sereke ew e ku di riya gel de be, ji bo veşandina zimanê Kurdi û ji bo pêkanîna edebiyata Kurdi ya nûjen bibe bingeh.”

Mîrza Cewerî, sebeba ku Nûdem her sê mehan carkî dertê jî wusa ïzah dike:

“Her çiqas hin hevalan xwes-tin ku em kovarê ji mehê carekê derxin jî, dîsan biryara ji sê mehan carekê hate dayin. Me got, em bi sozên mezin karêñ biçûk nekin, lê ku ji me bê em ê bi sozên biçûk karêñ mezin

bikin. Vêca di pêş de ko me dît ku hebûna kovarek bi vî babe-tî hewce ye û ji bo derxistina wê jî me hin îmkan bi dest xistin, wê çaxê bê şik e, ku em ê ji mehê carekê derxînin.”

Mîrza Cewerî, li ser celebnî-vîsên ku dê di Nûdem de bi-weşin jî wusa dibêje:

“Wê kovara me Nûdem bi kurtayî ji van celebnivîsan pêk were: Çirok, helbest, perçeroman, rexne, hevpeyivîn, lêkolîn, werger, edebiyata dînyayê ya modern û klasik, klasikêne Kurdi, xelatênav neteweyî, sî-nema, tiyatro, nivîsên li ser edebiyat, huner û kulturê, wêne, karîkator û hwd.”

Daxwazek Mîrza Cewerî ji xwendevanan heye ku, em jî xwe şîrîkê vê daxwazê qebûl dikin:




“Wek gelek heval pê dizanîn, ku aboriya vê kovarê ji ke-da şexsî peyda bûye. Lê ji bo ku kovarek wilo berdewam be û jîyanek dirêj bişî, wek her karî, ji bo wê jî alîkariya aborî lazim e. Alîkariya aborî ji abonetî ye. Ger em li kovara xwe xwedî derkevin, wê biparêzin, wê bixwînin, belav bikin, bibin abone û jê re abonan bibînin, wê kovara me nemire, jîyanek dirêj bişî û bibe Hawar'ek nû.”

Ji ber vê, em dixwazin nav-nîşana vê kovara delal li vir bin-vîsin:

Nûdem: Gamla Landsv. 36, 740 41 Morgongava, Sweden.

Telefon û telefax: 0224-61 428. Postgiro 636 36 25-2.

Em ji Nûdem a delal re daxwazê jîyanekir pirr dirêj in.



Berpirsiyarê Giştî yê kovara me SABAH KARA:

“ZIMANÊ NÛBIHAR, KURDÎ; Û ÎDEOLOJIYA WÊ, ÎSLAM E.”

*Em bawer in ku di mêtî û dilê gelê Kurdê misliman
de, cih û meqameke pirr fireh ji her tiştê ku
em dibêjin û êm dê bêjin re heye.*

Ji rojnameya *Özgür Gündem* Müslüm Yücel, bi Berpirsiyarê Giştî yê me Sabah Kara re hevpeyivînek tertîb kir. Metna Kurdî ya kamila vê hevpeyivîna ku di hejmara 10 Çileya Pêşîn 1992 ya *Özgür Gündem* de bi zimanê Tirkî hate weşandin, li jêr hatiye:

—Mîrza Sabah Kara; *Nûbihar di ananeyâ Islamî de ewilîn kovara Kurdî ye. Di hejmarê wê yênen derhatî de jî çanda İslamî û Kurdî, di giraniyê de ne. Di vê çarçivê de, gelo em karin ji Nûbihar re bibêjin “Kovara İslamî ya Kurdî”?*

Sabah Kara: Berî her tişfî ez dixwazim ku tiştekî di pirsiyara te de teshîh bikim:

Di hejmarên *Nûbihar* yênen derhatî de çanda İslamî û Kurdî, ne tenê “di giraniyê de” ne. Di van hejmaran de, ji bil çanda İslamî û Kurdî, ti tişfî din tineye.

Erê, *Nûbihar* kovareke Kurdî ye ku ji terefê grûbeke misliman û welatparêzên Kurd ên ku bi îdeolojiya İslamî baweriya wan heye û him xelasîya Kurdan û him jî xelasîya neteweyên din di vê îdeolojiyê de dibînin, tête weşandin. Zimanê *Nûbihar*, Kurdî; û îdeolojiya wê, İslam e. Lîbelê, tevî ku İslam a Xweda yek û yekane ye, ji ber ku di holê de ji yekî zêdetir terzên İslamê têne dîtin, gereke em rewşen bikin ku em ji İslamî ci

tişfî fam dikin û meqseda me ji İslamî ci ye.

Li gor bîr û baweriya me, her tiştê ku insanî ye, İslamî ye jî. Yanê her tiştê ku mutabiqê fitret û tebîeta insan e, İslamî ye. Naxwe li gor vê tarîfî her tiştê ku muxalifî fitret û tebîeta insan e, muxalifî İslamî ye jî.

Ev, tarîfeke pirr kurt, lê pirr jî xalis û net a İslam a ku di kitêba Xweda Qur'an de hatiye tarîf kîrin û bi awayeke pirr bitefsîlat hatiye şrove kîrin e.

Di vê holê de giringtirîn armanca kovara me *Nûbihar*, hemû qîmetên insanî hemêzkirin û bi hemû nezer, raman û kiryarê xeyrî-insanî û dijî insan re mucadelekirin û wan redkirin e.

—Armanca *Nûbihar*, bi awayek müşexes û şenbertir, ci ye? Meselen, aya *Nûbihar* dixwaze ku dengekî nû li edebiyata Kurdî zêde bike, yan ku dixwaze ku xwe ji edebiyata mewcûda Kurdî cûda bigre?

S. Kara: Rûpelên kovara me *Nûbihar*, ji her cûr qencî û spehîtiyan re vekirî ne. Di vê çarçivê de *Nûbihar* dixwaze ku bi-be şîrîkê hemû qencî û spehîtiyan edebiyata mewcûda Kurdî.

Li gor sair weşanên Kurdî, *Nûbihar* mîrasvaneke nezîktirî bi mîrasa çand û edebiyata Kurdî ye. Lewra weke ku hun dizanîn, tikes nikare eser û serkanîyên çand û hunerên Kurdî yêñ

berê, ji İslamî bidûr û cûda bi-hesibîne. Ev bi hîç awayî ne mumkin e. Bê li ber çava girtina İslamî, ti kes nikare ne Mela Ehmed ê Cizîrî, ne Ehmed ê Xanî, ne Baba Tahir ê Uryan, ne Mela Ehmed ê Betê û ne jî Bedîuzeman Seîd ê Norsî fam bike, bisengîne û bihêjîne. Hemû ev torevan û mutefekirê dahî, di navika İslamî de welidî ne, mezin bûne û eserên xwe li gor vê îdeolojiyê nivisandine. Han, *Nûbihar* pişta xwe daye vê mîrasa giranbihaya fireh û bi gavê mutmeîn û ji hatiya xwe emîn, di vê riyê de bipêş de diçe.

Em bawer in ku di mêtî û dilê gelê Kurdê misliman de, cih û meqameke pirr fireh ji her tiştê ku em dibêjin û êm dê bêjin re heye. Lewra ev deng, dengeke aşîna û mûnîs e ku gelê Kurd ê misliman vî dengî ev pirr sedsal in ji nêzîk nas dike û jê emîn e. İslam bi kûrtirî noqteya mêtî û dilê gelê Kurd ê mislimanê birûmet sıfrayet û nufûz kiriye û *Nûbihar*, mîrasvana van qîmetên ku di mêtî û dilê vî gelê birûmet de cih girtine ye.

Dilê hemû birayê min ên ku milê xwe dane bin barê *Nûbihar*, ji bona saxî û selamet û rizgariya gelê Kurd ê birûmet ditepe û ev birayê min, her kes û her besê ku ji bona bi dewakirina derdêن gelê Kurd dixebeitê û têkoşînê dide jî, dost û he-

val û hogirê xwe qebûl dikan.

Em di her cehd û xeyretên ku li xêr û menfaeta gelê Kurd in de hene û em muxalifê hemû cehd û xeyretên ku di eleyhê vî gelî de ne. Em bi dil û can, wan rojê ku dê gelê Kurd li ser piyêن xwe bisekine û di nav saîr gelan de cih û mewqieke la-yiqê xwe bigre, arezû dikan û ji bona vê, em hemû cehda xwe ji bona pêk anîna wezîfa ku li behra me dikeve, serf û xerc dîkin.

—*Bi qasî ku ez dizanim, xeylî wext e ku tu helbestan dînivîsî û ev helbest bi Tirkî ne. Sebeba ku te nuha bi vê sîftiyê zimanê Kurdî hemêz kiriye û tu bi vî zimanî eser dînivîsî, çi ye?*


S. Kara: Erê, ji sala 1979-80'an û pê de min dest bi wesanîna helbestê xwe yên bi zimanî Tirkî kir. Du kitêbên min ê helbestê weşîyan: *Helbestên Reş* (: Kara Şiirler) û *Mersiyeyên Rohilat* (: Doğu Ağıtları). Kitêba sêyemîna min a helbestan *Nameyên Bêcewab* (: Karşılıksız Mektuplar) hazırî çapê ye.

Lêbelê tim di dilê min de şikestinek hebû, ez tim dilşikestî bûm. Lewra ehl û nêzîkên min, dê û bavê min, birayê min û gelê min ê ku bi zimanê Tirkî nizane, tiştê ku min bi Tirkî dînivisandin fam nedikirin. Gava ku kitêbên min diweşîyan, min nedît ku diya min û ehlê min yên nêzîk, bibêj in "Han, kitêba kurê min!", "Han, kitêba ehlê me!" û bi kitêbên min ifşîxar bikin. Xwe

kêfgînbûyî nîşan didan; lê min didît ku ew kêfgîniya wan ne ji dil bû û bi tenê ji bona rahetkîrina min bû. Lêbelê nuha ne wusa ye. Nuha wextê ku ez ji wan re nivîsar û helbestên xwe yên bi Kurdi dixwînim, ez his dikim ku çavê wan û dilê wan ronî dibin. İfadekirina dilşâyî û kamîraniya xwe bi kelimeyan, li min pir zehmet têt. Nuha ez ji xwe dipirsim ku: "Gelo wan helbest û nivîsarê xwe yên berê yên bi Tirkî, min ji bona kî dînivîsî?" Di zimanê Kurdi de tabîreke callib heye; em dibêjin, "çira kora"; tiştê ku min berê nivîsîne, nuha

umetê dixwaze. Bi şiklekî kamil, tu di nav huwiyyeta netewiya Kurd û xwesta umeta İslamiyetê, çi irtîbatî dibînî?

S. Kara: Ez bawer im ku gereke Kurd li huwiyyeta xwe ya netewî xwedî derkevin, li ser piyêن xwe bêpayende bisekinin, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin, karbidest û serokên xwe bîzzat hilbijîrin û di her aliye jiyanê de li gor lizûmîn huwiyyeta netewiya xwe hereket bikin. Evan mafê tebîyiye jê na ye buhurtinê gelê Kurd in û ko nebin, qet nabe. Lêbelê ez di heman halî de, alîkarê pevrebûna bi xwest û ji dil jî me. Erê, gereke gelê Kurd di mudeteke kurt de û bi zûyî bibe xwendîyê hemû maf û xusûsiyetên ku gereke yek gel xwendîyê wan be. Lêbelê di dirêjmudefte de, ez alîkarê pevrebûna bi



wusa li min xuya dikan. Wextê ku ehl û nêzîkên min, ji dil û can guh didin tiştê ku ez nuha bi Kurdi dînivîsim û dibêjin "Te çiqas xweş gotiye!", ez ji kêfxwesiyyê mest dibim. Û ez arezû dikim ku rokê hemû xelqê min, xelqê mazlûmî Kurd jî vê bibêje û min tercumanê derd û kulê xwe, bestekarê şahî û cejnê xwe û mersiyevanê jan û elemêن xwe qebûl bike. Ez ji bona ku bigîhim vê şerefê cehd û xebatê dikim.

—*Kurd li huwiyyeta xwe ya netewî digerin. Di vê çarçivê de em karin bebsa çandeke netewî bikin. Lêbelê İslamiyet civata*

xwest û ji dila neteweyen misliman im. Yek "Yekîtiya Neteweyen İslamî" meselen. Lêbelê gereke ev yekîti ne mîna "Yekîtiya Sowyetan" a berê, ya li gor zorê û barkirina yekîtiye teşkilî bibû; gereke mîna "Yekîtiya Ewrûpa" ya ku li gor pevrebûna bi xwest û ji dil e û li ser esas û bingeha wekheviyê teşkil bûye, gereke teşkil bibe.

—*Baş e, lê ma gelo ev, bi xwesta civata umetiya İslâmî, li hev dike?*

S. Kara: Kî dibêje ku li hev nakin! Qur'an a ku huwiyyeta neteweyan, "ayeta Xweda" û "suneta nabedilê ya Xweda" qebûl

dike, dê çawa bi navê Umeta İslâmî, wê huwiyyeta neteweyan red bike û wê ji bona asîmîlas-yona wan bixebite? Ma ev hîç tişteke bûyinê ye? Ma ev kare bibe? Heger tiştek wusa mewzûbehs bûna, ma gelo di coxrafya İslâmî de ji bil Ereban hîç irqek din heta îro, dima? Ew ku, mîna ku hun dibînin, di vê coxrafyê de ne tenê neteweyên misliman, lê eqeliyetên ne misliman û hetta kesên mîna Yezidiyan jî, huwiyyeta netewiya xwe muhafaze kirine. İslâm hergiz ne muxalifê vê ye. Bil eks, bi qasî ku wê adet û enaneyên herêmîye, yekî ji serkaniyê huqûqa xwe bîhesibine, bi pêş de gav avêtiye İslâm. Sistemek wusa ye. Yekîtiya umetê, yekîtiyek li gor pevrebûna bi xwest û ji dil e û li ser bingeha mafê vekheviyê teşkil dibe. Ev, hengama ku İslâm rast tetbiq dibû wusa bû û gereke ji vir û pê ve jî wusa be. Qederên neteweyên misliman, bi şida bi hev ve girêdayî ne. Loma tez a "Yekîtiya Neteweyên İslâmî", di vê coxrafya ku em tê de dijin de rastetirîn û payidartirîn tez e. Neteweyen Roava yên Katolik û Ortodoks û Protestan ên ku bi mudeta sed-salan xwîna hevûdu rijandine, vaye hatine cem hevûdu, yekîtiyek teşkil kirine û kedxwariya gelên ku mensûbê baweriyên din in dîkin. Ma dê çîma em ên misliman jî li ser bingeha îman, çand û adet û enaneyên müşterek neyin cem hev û mafêن xwe muhafaze nekin? Ma xwestek ji vê maqûltir heye? Lewra wexte ne wextê perçe perçe bûnê û ji dijminan ra xwe mîna loqmeyan pare kirinê ye, lêbelê wextê yekîtiya bi xwest û ji dil e. Hatiya neteweyên misliman, di "Yekîtiya Neteweyên İslâmî" ya ku li ser bingeha wekheviyê teşkil bûye de ye. Lêbelê bi cih anîna vê yekîtiyê, kareke pirr çetîn û dijwar e.

Ji Tirkî: Hozan Oflaz

Berpîrsiyarê Giştî yê kovara me
SABAH KARA:

"WEZÎFEYA HEYATÎ YA LI BER REWŞENBÎRÊN AZAD Û BIRÛMET EVE KU, ÎTIMAD BIDIN GELE XWE Û BIKIN KU GELE WAN BIBÊJE: "HEGER WAN GOTIYE, NAXWE RAST E!"

Heftenameya *Azadî* di heqê "Herekata Daxîlî" (:Îç Harekat) a leşkerên Türk de lêpirsînek tertîb kir. Metna kamil a Kurdî ya pîrsiyara heftenameyê û bersîva Berpîrsiyarê Giştî yê kovara me Sabah Kara, ya ku di tarîxa 20-26'ê Çileya Pêşîn 1992'a heftenameya *Azadî* de bi Türkî hate weşandin, li jêr e:

—Sebeba ku cemiyet û bi taybetî jî raya gelempériya demokratîk, di heqê "Herekata Daxîlî" de bi heddê kafî reaksiyon nîşan neda ci ye û li gor ramana te gereke li ber vî halî ci bibe?

Sabah Kara- Raya gelempériyê ne tenê di heqê "Herekata Daxîlî" de, lê di heqê gelek xusûsên wusa yêñ pirring û heyatî de jî nikare bi

heddê kafî reaksiyon nîşan bide. Min go "nikare nîşan bide", lewra ji imkan û hazırlîyên ku dê firset bidin ku reaksiyon nîşan bide, mahrûm e, yan jî hatiye mahrûm kîrin.

Ev mahrûmiyet, di heqîqetê de pirr ji berê ve têt, lê kesat û qıht û stewra esasî, mahsûlê dewra TC ye. İdareya ku TC bi fesxkirina Meclîsa Ewil bi metodê despotane teşkil kir; idareya leşkerî, yan Leşkeriya Giştî (:Genel Kurmay) heta îro dom kiriye û ev idare bi perçiqandina her cûr ramanê azad di bin gizmeya hesiniya xwe de, teşkilâ raya gelempériya azad û bê şert û şurt re teamudûn men kiriye. Yanê failê ve bêdengî û bêreaksiyonê, idareya TC ye û ev idare bi sayeta radyo û televîzyon û

rojname û kovar û sair unsûrê komînîkasyonê û ji riyên din, raya gelemerî dihoyîne û dike ku gel bêreaksiyon bimîne.

Ev yek cebhe... Cebha din, ji rewşenbîrên ku karîne xwe ji hoyandin û bêreaksiyon kîrina TC xelas bikin teşkîl dibe ku gelemeriya van rewşenbîran jî, bi zimanê gelê xwe, yanê bi zimanekî ku gelê wan karibe peyivêwan fam bike nikarîne bipeyivin û bi bîr û baweriyan gelê xwe dijmînetiyê dikin û ji ber vê jî, nikarîne bi gelê xwe "îtimad" bidin.

Min peyiva îtimadê perçinand, lewra riya ku hun dê bikin ku gel guhê xwe bide we ewe ku, hun îtimadê bîdinê.

Îro raya gelemerî nizane ku wê guh bide kîja kesî. Unsurên telekomînîkasyonê yên ku di bin ajotina dîrekt û endîrekt a dewleta TC de ne, bi raya gelemerî bidom hovîtî tezrîq û şiringe dikin û ji bona ku di pirsên ku ji bo gel pîr giring û heyatî ne raya gelemerî bêreaksiyon bikin, tiştê ku ji destê wan têt, dikin. Lîbelê li ber vî halî "cebha muqabil" temamen ji hev feşkilî ne û nikarin hîle û desîseyên dijminên gelê xwe li hîçê derxînin. Naxwe wezîfe-ya heyatî ya li ber rewşenbîrên azad û birûmet eve ku, ji vê pirsgirêkî re çare peyda bikin û îtimad bidin gelê xwe û bikin ku gelê wan bibêje: "Heger wan gotiye, naxwe rast e!"

Em ên mensûbê civaka *Nûbîhar*, di vê holê de tiştê ku ji destê me têt em dikin û em hemû rewşenbîr û azadfîkrênu ku wek me li ber vî halê mewcûd reaksiyonê nîşan didin, heval û hogir û birayêñ xwe hesab dikin. Ev, çekek spî ye.

Ji Tirkî: Hozan Oflaz

MI UMRÊ XWE LI HÎÇÊ XERC KIRIYE

Mi umrê xwe li hîçê xerc kiriye
Canê mi di agir de şewitiye
Hîç kesî bi kesê dî ne kiriye
Tiştê ku mi b'destê xwe b'xwe kiriye

Mi fêda emelê xwe ji dest daye
Mal û milkê xwe b'ziyan firotiye
Ji bona gul dankke şkestî li vir
Mi ci gunehan li xwe bar kiriye

Mi emela tim bi riya kiriye
Wax eceb mi îxlas jibîr kiriye
Kes nizane sibeha şevê çiye
Tûlî emel pişta mi şkandiye

Mi umrê xwe kirye xerca jiyanê
Ji ziyan malûm, mi ci kar kiriye
Gunehê Yûnis ê bêçare pîrrin
Çavê mi li lutfê dergeha Wî ye

Yûnis Emre
Ji Tirkî: Hozan Oflaz

ÎNNA LÎLLAH WE ÎNNA ÎLEYHÎ RACÎÛN
MELA UB俞DULLAH DALAR ŞEHÎD KIRIN
ZALIMAN LI DIYARBEKRÊ SEYDAYÊ HêJA MELA UB俞DULLAH
Dİ ROJA 21.12.1992 DE HEWSA CAMIYÊ DE ŞEHÎD KIRIN,
REHMETA XWEDA SER ŞEHÎDÊ ME
Ü LANETA XWEDA SER ZALIMAN BE!
nûbîhar

MA TIM BERMAY

*Ya Rebbî... Heta ci waxt wina milê ma çewt,
zerî da madi derdî, ma do jîn bê.
Ya Rebbi ti bireyni!*

MUHAMMED PAŞA

D ayê, ewnena rojhelat ra... Adirê veşeno zerî da cidi. Bermena. Hêsrî, ciman dê cira rîjbiyê.

La jê ci Bawer ame, maya xwu no hal di dî. Mehsûm mehsûm pers kerd:

—Dayê! Tiya çiçî xeyal kena? Çimê to zî biyê sûr, tiya berme-na?

Werişt xwu ser, hêsrê xwu laj dê xwu ra numîşî. Qayil nê bî lajê ci bizano aya bermenâ. Ahê ant û Vajîyê:

—Ax lajê mi ax!.. Ti bizanê na maya to ci rojî diyê. Ti bizanê na milleta ma ci rojî diyê, ci zilmî antê. Goşanê ma ci hahoy aşnawitê, kezeba ma ci derdî antê.

Bawer:

—Senî dayê?

—Lajê mi... Ma verî nê erdan dê xwu di, bi weşeya jîn biyê. Erdê ma zahf rindî bî. Qandê coy, zaliman çim verda erdan dê ma. Ma talan kerdî. Ma tim zilm vîna, ma tim pay bî, ma tim bermay. Diyarbekir, Helepcé, Şirnex û Dêrsim di merdimê ma bi sehezerana kişî. Hahoya ma resayê azmînî, hima vengê ma nêşî kesî.

Qîr qîra qeçan dê ma zerî veşnayê hima dinyay nê aşnawit.

Dinya alem pêro marê bibi dijmen. Hana vizêr zalima Helepcé di heşt hezarî merdimê ma kişî, Şirnex pêro xirab kerd, fina kesî vengê xwu nêvet.

Bawerî pers kerd:

—Dayê, ma qebhetê ma çiçî bi?

Daye vat:

—Qebhetê ma, ma mislimanî bî ú ma Kurdî bî, ma bê wayir bî ú tenya bî. Ma bê kesî bî . Ma kesîrê zilm nê kerdê. Ma xapeyay hima ma kes nêxapeyna. Qandê coy zalima ziwanê ma kerd qedex. Heywwanî jî bi ziwan dê xwu ya qisey kenê, hima ma bi ziwan dê xwu ya nêşayê qisey bikerdê

Bawerî bi heyreta pers kerd:

—Ê merdimê, ki marê zilm kenê vanê ma edalet wazenê, birayey wazenê... No senî edalet no senî biraye ya?

—Lajê mi, Allah Teala, Qur'an di vano kî: "Kes îna rê vajo, dinya di xirabey mekerê, ê vanê nê ma rindey kenê" (Beqera, 11). Ti nézanê nê çend zallimî. Tayna girdbi ti do fam bikerê.

—Helepcé û Şirnex ez kerda gird dayê... Serrê mi werdiyê, hima ezo girda ra hesab bipersa.

Maya ci destê xwu rona doşîda Bawerî ser û vat!

—E lajê mi... Ez zî tora ney pawena. Nê zalima şerefê dînay kerd erdî bin. Rojê dinya di edalet bibo hakim, o do hesabê nê zilmî pers kero. "Ê zalimî, do bizanê nezdî di înqilabê do senîn ya biqelibyê."

Bi tehkîk Bawer lajekê do zahf baqil bi. Persê ecaîbî mar da xwu ra pers kerdê. Fina pers kerd:

—Dayê, heta nika ma qandê azadî se kerdo?

Maya ci tayn vinderd, pej-

meryê û vat:

—Ma zahf serhildanî kerdî. Ma guniya xwu rişnê, Kurdistan di ti bewnê kotî ra, ti do vengê Selahaddînî, Şêx Seîdî, Bedîuzemanî bi aşnawê. No welat bi qîmetyo lajê mi... Bi se serana Pêxember û ewliyaya boyâ secda veradê nê erda. Qandê nê mîras dê Pêxemberê ma zahf gunî dê. Ma herra xwu, günî da xwu ya şiwit.

Bawerî nêşa xwu vêşî tepşo û berma:

—Ma do wina tim linga bîndi bimanê dayê? Ma do tim bîbermê. Tew dewleta ma do çinê bo?..

Dayê lajê xwu ant xwu virar û vat:

—Nê lajê mi... Ma do nêbê sist û gewseg nêbê... Ma qandê Dîn dê xwu, qandê milleta xwu bi xeftiyê ma do bireyê. Ma çend bikişyê, ma do hend bêrê dinya.

Bawer, hana bermayê... Ze-riya marda ci veşê.

—Meberm Bawerê mi. Ci waxt wayirê welatê xwu bê, waxta ma do rojan dê weşan di piya bê. Waxta roj do akewo ma ser.

Mayaci zî nêşa xwu tebşê.. Hêsrî çiman dê cira rişyay. Bermê... Zerya ci veşayê. Warişt xwu ser. Ewna hewra ra. Destê xwu hewaday û dua yê kerd:

—Ya Rebbî... Heta ci waxt wina milê ma çewt, zerî da madi derdî, ma do jîn bê. Ya Rebbi ti bireyni!

PÍTROS

SERWER PÜRYA / SABAH KARA
Wênevan: FERİSTE FAZILÎ

Civikeke şad û şox û lîstikhez, bi bayê bi harê re pêşbazî û musabeqê dikir û bi her cih serek lê dida. Ba, têra xwe li pişt çivikê piçûk bi vî alî û wî alî de çû, serê xwe li daran da, talî westiya, çû da hinek îstîrahet bike û bîhn bigre. Lêbelê çivikê ku ji hewaya xweş a Biharê û ji hêşinî û tezetiya wê, şad û mest bibû, hê hazir nebû ku vegere hêlîna xwe. Li ser bilindtirîn çiqlê dara şahbelot a pîr a cangil rûniş û ji dostên xwe xwest ku pevre pîtroskê bilîzin.

Çivik bi baskê xwe çavêن xwe girt û bi çîk çîkan dest bi hêjmartinê kir, heta ku dostên wî xwe veşîerin.

Margise di cihê xwe de bêhereket ma.

Kîso hêdî hêdî dest û pa û serê xwe kişand nava kîsê xwe û weke kevirkî li derekî rûniş.

Jîjo xwe kire wek topêkê, gindirî û çû da kû xwe veşêre.

Meymûnê ku ji vî şaxî bi wî şaxî dihilbehî, nizanîbû ku xwe li kû veşêre. Dawî xwe di nava şax û pelên

dara şahbelota pîr de hilawîst û di cihê xwe de ma.

Tav a ku kêfa wê ji lîstika heywanan re hatibû, aheste aheste xwe da pişt çend ewrên reş û pînhan bû. Marmaroşk û beq hê ji bi wî alî û vî alî de bazdiyan û nizanîbûn wê ci bikin û bi kîja alî de herin.

Marmaroşk aheste tiştek di guhê beqê de got û herdu bi lez ji holê winda bûn.

Çivik çîk çîk kir:

—“Ez hatim, ez hatim.”

Baskê xwe ji ser çavê xwe anî xwar û bi dîqet li çarmandorê xwe meyizand.

Hewa tarî bibû û çivik ti cihî nedidît. Li azman meyizand û li tavê geriya. Hinek ji çîrîskên tavê li pişt ewran jiderve mabûn.




Çivik baskê xwe bi lez lihev xist û bi aliye tavê de firî:




—“Ahey... Tav, tav! Mi çîrîskên te dît.”

Tav, bi nerehetî, hat nava azman û her cih cardin rewşen bû.

Çivik bi wî awayî ku vî alî û wî alî dimeyizand, çavê wî bi fersekî ket. Ji xwe re got:

“Mi vî li vir nedîtibû!”





Firî û çû li ser ferş danî. Çarmandorê xwe qenc meyizand, hinek ji dûvikekî ji bin ferş li derve mabû.

Çivik bi xweşhalî qîr da:

—“Hay, marmaroşk! Mi te genc peyda kir.” Û bi nikilê xwe, dûvikî kişand û kişand û kişand.

Kîsöyê ku dûvê wî êşiyabû, xir e xir kir û dest û piyê xwe hêdîka ji tiqalê xwe derxist.

Çivik kenî û go:

—“Naxwe ev tu bûyî?”

Û cardin meşxûlê ger û meyizandinê bû. Ji nişka tişteke ecêbî di nava şax û pelên şahbelotê de dît.

Bi xweşhalî qîr da:

—“Meymûn, meymûn! Tu çima ewqas dilebitî? We're derve. Qewet be.”

Meymûn ji darê hilbehî xwar û dengê qîr e qîrê wî bilind bûn:

—“Ax piyê min, ax piyê min... Ma ev topa stiriyan li vira ci dike?”

Bi dûvikê xwe bi şida li topê da û wê avête nava avê.

Jîjoyê ku dikir bixeniqe dest bi hawara kir û dest û piyê xwe li avê da û ji meymûne bêdîqet re dest bi nifira kir.

Meymûn destê dirêjê xwe hê jî dirêjtir kir, teriya jîo girt û wî kişande derve.

Çivik dilê xwe girtibû û dikeniya.

Jîjo bêfasile li meymûnê ku wî derxistibû holê, nifira dikir.

Çivikê piçûkê ku hinek betilî bibû, çû li ser şaxekî darê danî û ji jor bi dîqet her tiştî meyizand.

Beqa delal, zimanê dirêjê xwe ji binê pelên hêşin dirêj kiribû, da kû pêşîyan nêçîr bike ku çavê dûrbîne civik pê ket.

Beq, qor e qorî kir û xwe avête avê, xwe gihand pelê hişkê ku li ser avê bûn û çû li ser wan rûnişt, da ku bibîne wê netîca lîstikê bibe çi.

Marmaroşkê ku heta wî wextî bêdeng û aram li ser kevirekî rûniştibû, lê germ hat. Aram aram dakete binê kevir.

Lêbelê beqa delal, bi çavê gilover û mezinê xwe wî dît û qîr da:

—“Aha! Nabe ku kes cihê xwe biguhere.”

Û marmaroşk jî ji lîstikê derket.

Hemû heywanat hat in arîkariya çivik, da ku şayed bikaribin margîse peyda bîkin. Lê nebû ku nebû.

Çivikê ku dilê wî nedix-west bixisire, çîk e çîk dikir û bang dikir margîse. Lêbelê jê, ti xeberî nebû ku nebû.

Tava ku ji tavandinê betilî bibû, ji ehlê cangil xatir xwest û aheste çû pişt çiyê, da ku hinek îstîrahet bike.

Heywanatê ku ji peyda-kirina margîse bêumêd bibûn ji hev xatir xwest in û çûn hêlinênen xwe.

Çivik hê jî ji jêr bi jor û ji jor bi jêr, vî alî û wî alî bi dîqet dimeyizand, da ku şayed margîseyê zereng peyda bike.

Ma zarokino, gelo hun dibêjin ku margîse xwe li kû derê veşartibû?

RÊZIMANA

KURDÎ

VEQETANDEK (Zêder)

Vê re “herfî tarîf” jî tê gotin; dikeve navbera du navan an navek û rengderekî ji bo ku wan pev re bide girêdan û cins û tibaba wan bide zanîn. Ev, sisêne: Ji bo cins ï nêr “ê” bo cins ï mî “a” û bo cinsî nêr û mî ya gelejmarîn jî “en” tê. Yanê: ê, a, ên.

Gava nav, têrkerek distine bivê-nevê vegetandekê tê dawiya wê. Têrkera ku vegetandek distîne çar cûre nin:

1) **Navek an du sê navan.** Wek: *mamê Sînemê, law û bav û birayên xwe.*

2) **Rengderek wesfin.** Wek: *gula sîpî, xortê hêja.*

3) **Rengderek destdaniyê.** Wek: *birayê min, hevalê te.*

4) **Pronavek pêhatî (gi-rekî).** Wek: *mirovê ku hat, mektûba ku min nivîsî.*

Zêdeyî di nivîsandinê de van rêzên jêrîn jibîr nekin:

a) Ger nav bi dengderekî diqede, tîpa “y” tê pêsiya vegetandekê. Wek: *ga- gayê cot.* (Lêbelê carînan wek “gaê cot” jî tê nivîsandin ku ev xelet e.) *mû-mûyê res, serî- seriyê rût.*

b) Navênu ku bi “î” an “ê” diqedin û ku tîpa “y” girtine, ew herdu jî bilindekê (kumik) xwe davêjin û dibin “î” an “e”. Wek: *dê- deya min, rê- reya min an riya min.*

c) Navênu nêrza ku tîpa “a” heye, ew “a” dibe “ê”. Wek: *agir- düyê égir, ga- here gê bîne, masî- em mêsî dixwin.*

Lêbelê bi rengekî din jî em

dikarin van bikar bînin. Ger hun tîpa “î” bixin dawiyê, ew jî rast e. Wek:

-düyê égir dê bibe düyê agir,

-gê bîne dê bibe gayî bîne,

-mêsî dixwin dê bibe masiyî dixwin.

Rakirina veqetandekê: Carînan di navbera navan de vegetandek tête rakirin, bi vî avayı jî bêjeyêne nû çê dibin. Wek:

-mişkê kor: *kormışk,*

-gula sor: *sorgul.*

Ger em wisa çep venegerînîn jî dîsa bêjeyêne nû diafirînîn.

Wek:

masîmar, müşekor, gulsorû hwd.

PÊŞKERA HÊJMARKÎ

Jê re “vegetandeka nepenî” jî tê gotin an jî “zêdera nepenî” (article indefinite). Ev biwêj di axaftinê de tiştekî nepenî bi awayî nenas pêş me dike, du bes in:

-Ji bo nêr û mî yekejmar: -ek, -eke, eki, -eke,

-Ji bo nêr û mî gelejmar: -in, -ne.

Mînak: *jinek, jinikek bedew, keçeve bedew, mirovin, bespin, mirovine, bespine, sêvine* û hwd.

Nîşank: Ev rêzên jorîn di gelejmarîya navan de jî têne bi kar anîn. Di zmanê Kurdî de der vê babetê rîyeke din jî heye, ev jî bikaranîna parekê “î” ye, Parekê “î” bê zayend e. Cîhê navê nêr û mî digire. Navan li hev dide girêdan û ahengdariya zmîn pêk tîne. Wek: *birayê min*

î mezin, gayê me î cot. Pareka “î” tim gava ku zayend e, her cûda tê nivîsandin.

TEWANDINA NAVAN Ü PÊŞKERÊN HÊJMARKÎ

Nav bêjeyênu guhêrbar in, yanê têne tewandin. Gava:

a) **Têrkera navekî din e: birayê Sînemê, hespa Tacînî.**

b) **Ko pêsiya nav, daçekê heye: Ji Diyarbekrê, di gundan de.**

c) **Ger nav, kirde ya leke-rekê ye: zaroyan xwar, Ferzendî got.**

d) **Têrkera lêkerekî sergerandî ye, ya dema niha û pêşhatî de: ez Sînemê dibînim, ew hevalan tîne mala xwe.**

Wekevî em dibînin li jor te-wanga navan de sê parekên rêzmanî derbas dibin. Navênu nêrza tîpa “î” û navênu mîza tîpa “ê” û gelejmarîya van herdukan jî tîpê “an” girtine. Rêzên te-wanga navan ev in: î, ê, an.

Xweş bala xwe bidinê û van bi vegetandekê re têkilî hev me kin. Yênu vegetandekê ê, a, ên in û yênu tewangê jî î, ê, an in. Di mamê Sînemê de “ê” ya “mam” vegetandek e, lêbelê “ê” ya “Sî-nem” tewang e.

Tewandina pêşkerên hêjmarkî jî wekî navan e. Birastî -ek û -in tenê parênu pêşkerê ne. -eke, -eki, -ekî û -ne tewandina wêne. Wek: *jineke baş an jinek baş, mirovinne baş an mirovin baş, zarokek piçûk an zarokne piçûk* û hwd.

FERHENGA

KURDÎ - TIRKÎ

(1)

ROJİN ZELAL

A, a 1. Kürt Latin alfabelerinin ilk harfidir. Arap alfabelerinde "meddi elif" ile gösterilir. Uzun sesli olup, dudakların açılmasıyla girtlaktan çıkar. 2. Hayret ve ünlem işaretidir: **A, çiqaş baş e!** 3. Cins edatı olarak dışılık aranımı verir: **Jiyana min. Keça bedew.** 4. Çoğul eki **an'in n'si** atılmak suretiyle yapılan kısaltmada çoğul eki olur: **Welatê mirova.** 5. Maddelerin fıkra ve bendleri gösterilirken "1" rakamı yerine kullanılır.

Ab Ağustos ayı.

aba aba, kalın kumaş.

abajûr abajur.

abal 1. (Fikren) dönüş, mesela dindeki dönmek gibi. 2. geri dönüş, vazgeçme. 3. dönmüş, vazgeçmiş kimse.

abalbûn geri dönüş, geri dönmek, vazgeçmek.

abanoz abanoz ağacı.

abegîne cam, billûr.

abid abit, ibadet eden, dindar kimse.

abidane abidane, abitçe.

abîde abide, anıt.

abîne Nargilenin suyun içine giren boru kısmı.

abis Okyanusların çok derin ve güneş ışığının erişemediği kısmı.

abone abone.

aboneman abone olan kişi.

abor 1. kalıntı, iz. 2. geçim, gerekler, geçim için gerekli ihtiyaçlar.

aborandin 1. idare etmek, geçirildirmek. 2. (Mal, eşya) satmak, satılmış.

aborbûn (Geçimsel olarak) idare etmek.

aborî geçim, ekonomi, iktisat. /

aboriya xwe xweşkirin geçimi düzeltmek, geçimini yolu na koymak. / **aboriya zanîstî** bilimsel ekonomi, bilimsel iktisat

/ **zanistiya aborî** ekonomi veya iktisat bilimi.

aborkirin (Geçimsel olarak) idare etmek.

aborînas bkz. aborîzan

aborînasî bkz. aborîzanî

aborîzan ekonomist, iktisatçı.

aborîzanî ekonomi, iktisat bilimi.

abûri bkz. aborî

abzung bkz. avzung

aciz bükmiş, usanmış.

acizbûn bükerek, usanmak. / **je acizbûn** bir şeyden bükerek, usanmak.

acizi bükünlik.

acizkirin bükürmek, usandırmak.

aciz aciz, çaresiz.

acizbûn aciz olmak, çaresiz olmak.

acûr kiremit.

acûrpêj kiremitçi, kiremit pişiricisi.

acûrpêji kiremitçilik, kiremit pişirimi.

adab adap, usûl, âdet.

adabî muaşeret adabı muaşeret, görgü kuralları.

ada budama.

adakîri budanmış.

adakîrin budamak.

adan 1. süt ürünler. 2. besin, gıda. 3. verimli, doğurgan, mümbit.

adanî 1. sütsel, süte ait. 2. bereket.

Adar Mart ayı.

adarîk Mart ayında çıkan ve Arapça "zuhir" denilen bir ot cinsi.

ade¹ 1. isiran böcekler, haşerat. 2. şirret, sırasık, can sıkıcı şey veya kimse.

ade² budama.

adekirin budamak.

ade³ yabani otlar.

Adem Hz. Adem..

adem adam, insan. / **benî adem** beni adem, insanoğlu.

ademî insana ait, insanî, insan olanlar.

ademza insanoğlu.

ademzad bkz. **ademza**

adenît lenf düğümleri iltihabi.

adese mercek, adese.

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe ve ji hejmara [...] pê ve min bikin abone-ya/aboneyê kovara **nûbihar**.

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiyê:

Li hundur: Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

Li derive: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonatiyê dagirin û tevlî kopyeke pela razandina bedela abonetiyê bişnin navnîşana me.


Navnîşan:

Fevzi Paşa Cad. Başhoca Sok. No: 49/1

Fatih - İstanbul Tel: 533 75 88

Bedela abonetiyê:

Li hundur: 120.000 TL. **Li derive:** 50 DM.



CEPERAST:

1- Bi navê "Melayê Meşhur" hate zanîn. Mela, seyda, rewşenbîr, alim û mamosteyeke bi nav û deng. Sala 1873 li gundê Norsê, qeza Hîzanê, bajarê Bedlîsê hate dinyayê. Sala 1960 li Rihayê wefat kir. Bi navê "Rîsaleyên Nûr" 130 kitêb talîf kir. Heta dawiya heyata xwe ji bo dînê Îslam mucadele kir, zilm û zorî kişand. 28 salê wî di koçberî û mahpusxanan de derbas bû. Dixwest ku bi navê Medresetu'z-Zehra zanîngehekî vebe. Heta dawiya heyata xwe ji bo îtîhada Îslamê xebitî. (Resma di navê de.) - Qumaşek qalind, eba. 2-Feqîr, xizan, belengaz - Bendik, dezî - Gotinêni bi belaxat, bi wîje. 3- Di bîjîkî de xal, şanik - Du zaraken ku bi hevûdu re ji dîyek hatine dinyayê - Ser, qehf. 4- Hênan, hereketa ku meriv tiştek bi xwe re tîne - Lêkereke sergerandî, tevlîhev kirin - Navê bombekê ku Amrika avêtiye Hîroşîma û Nagazakî. 5- Naynûkên heywanan - Dîn - Tişta ku ji kaniyê diherîke (berepaş). 6- Bi Erebî "bira" - Emeke heywanan - Kesê ku tengasiya mal û dirâfiya xwe heye, kesê dilsaf, feqîr. 7- Doşandin, doşin - Nexweşiyek, fê, edr. 8- Parçe-reşiyek piçük ku çar alî xwe bi avê hatiye girtin - Xurek,

xurdemenî, xwarin. 9- Cejn, roja piştî meha Re mezanê ku tê pîrozkirin - Her perçeve trênen - Cîhê ku av jê diherike, cavî. 10- Ew merivê ku du merivê xeyidandî lihev tîne, navend - Hogir, dostne. 11- Cihê ku di taldê de dimîne û tavâ rojê lê na-keve, say - Roja piştî pêncsembê - Gundê Bedî zeman Seîd ê Norsî.

SEREJÊR:

1- Eyûbî yê Kurdi. Qumandareke Kurd û meşhûr. 2- Eşq, sewda - Xwe - Aletek ji hesin ku pê çilo milo tê birrîn. 3- Navekî mîran - Brayê mîr - Ji bo tişt û kesê nîr ê nêzîk tê gotin. 4- Dê, dayê - Devê teyran, nikul. 5- Qebîle - Tiştê ku maddî nîne. 6- Ka, hele - Bi erebî pêşî, îstîqbal. 7- Mêvanxane, xan. 8- Kesê ku hedîs neqil kiriye - Ax!, ku cihek meriv êşıya tê gotin. 9- Bi Tirkî şikefta hîrc û rovî û hwd - Tiştek ku ji genim çêdibe. 10- Hejmarek (berepaş) - Lask, frêze, qarot, sap (ji bo dexl û zadê ye.) - Roj, tav. 11- Zadeganî, mîrzetî - Gidik, çêla bizinê. 12- Tiştê ku mirov pê kar di-ke - Dewleteke kevin. 13- Nexweşiya ku li devûrûyê însan, lî ser çermê însan xûya dibe - Weya, weyaxûd, yan. 14- Ezman, sema - Şahid.

Amadekar: **ALİ KEÇELİ**

weşanê nûbihar

(nûbihar yayınları)

Rêza kitêbên Kurdi
(Kürtçekitaplardizisi)

Rîsala Biratiyê /Bedîuzeman Seîd ê Norsî.....	15.000 TL
Rîsala Biratiyê (Erebî)/Bedîuzeman Seîd ê Norsî.....	15.000 TL
Peyivê Piçûk /Bedîuzeman Seîd ê Norsî.....	20.000 TL
Peyiva Bîst û Seyemîn /Bedîuzeman Seîd ê Norsî.....	15.000 TL

Rêza kitêbên Tirkî
(Türkçe kitaplar dizisi)

Şırnak Baskını /Osman Resulan.....	20.000 TL
---	-----------

Di xwestinê we yên tevayî de, kitêbên Kurdi bi **30 %** erzanî; kitêbên Tirkî bi **40 %** erzanî têñ şandin.
(Toplu isteklerinizde Kürtçe kitaplarımız % 30, Türkçe kitaplarımız % 40 indirimle gönderilir.)

Deynê xwe rîbikin yekî ji van hesabêñ jêr:
(Borcunuzu aşağıdaki hesaplardan birine yatırınız:)

Postgiro (Posta çeki): Süleyman Çevik, 658265.

Jimareyêñ hesabbanqî (Banka hesap numaraları):

Li hundir (İçerde): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi 1079 - 300 - 235999.
Li derve (Dışarda): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi 1079 - 30100 - 3118770.

Navnişana me (Adresimiz):

weşanê nûbihar

Fevzipaşa Cad. Baþhoca Sok. 49/1
Fatih/İstanbul
Tel: 533 75 88



"Bombaran" (Museyn Xusrevcerdi)